

Dîktatoriya xwînmij a Seddam bi çekên kîmyayî Helepçe wêran kir

Ew kesên ku di erdê de cî çêkiribûn û bi vî hawî xwe ji ber bombardûmanên balafiran diparastin, îcar jî bi gaza jahî mirin

Gelek bajarên din jî hene ku ew jî her bi vî rengî hatine bombardûmankirin û loma jî ehlên bajêr, bajar terk kirine. Lê belê bêtir ku kes jî bi vî yekê bizanibe. Van gotinên jorîn rojnamevanê Swêdî Stefan Hjertên piştî vegera ji Helepçe di rojname "Aftonbladet" de digot.



Foto: Stefan Hjertên



Foto: Stefan Hjertên

Di 19'ê Adarê de li Stockholmê ji alî Yekîtiyê Nîştîmanî Kurdistanê ve li ser jenosîda Helepçe belavokê hat belav kirin. Di belavokê de dihat gotin ku, balafirên Iraqê rojên 16-17'ê Adarê Helepçe, Darûpiştî û

Dolî Cafetî bi bombeyên kîmyewî 96 caran bombardûman kirin û di van êrîşên hewayî de bi kêmasî 5 000 kes mir û bi hezaran jî birîndar bûn. Vê xeberê her du rojên pêşîn piir bala masmediya Swêd neki-

şand. Lê piştî du rojan, gava televîzyonê ji jenosîda Helepçe hin sûretên wahşetê rê da, wê çaxê masmediya û bir û raya cîhanê nuh hay bû û ji ciddiyeta meselê bawer kir. Dûmahîk r. 11

Nasandinek li ser bajarê Helepçe r. 3

Nasandinek di derheqê çekên kîmyayî yên ku li Helepçe hatine bikaranîn r. 3

Di derheq qetlîamê de roportaj û hevpeyvîn r. 6-7

Jenosîda Helepçe li Ewrûpayê bi xurtî hat protestokirin

Li wan welatên Ewrûpayê ku Kurd lê dijîn jenosîda Helepçe bi gelek hawî hat protestokirin; avayiyên rêxistinên însanî û navnetewî, avayiyên ajans, radyo û televîzyona îşxal bûn, ji wan daxwaza piştigirî û alîkariya maddî û manewî hat kirin; bi hezaran belavok bela bûn, mitîngên (meşên) bi girseyî hatin çêkirin.

SWÊD

Di 24'ê mehê de (2-03-'88) li dora 200 kesî çûn ber Meclîsa Swêd û ji hukûmetê daxwaza alîkariya maddî û manewî kirin û xwestin ku hukûmeta Swêd vî jenosîda li hember gelê Kurd çêbûye bi hawekî fermî (resmî) protesto bike. Li ser navê hukûmetê bi Wezîra Bazerganiya Der-va Anîta Gradîn re hat peyivandin.

Anîta Gradîn ev qetlîama mahkûm kir û soz da heyeta Kurdan, ku wek hukûmet çî ji destê wan bê wê derax nekin (textîr nekin).

Piştî vî, cardin grûbek mezin çû Xaça Sor û bi serokê wê re peyivîn. Ji serokê Xaça Sor daxwaz hat kirin ku ew vî hovîtiyê û jenosîdê mahkûm bike, heyetekê bişînin ciyê qetlîamê û her wisa bi kesên birîndar re alîkariya ûbbî bikin. Daxwazên meşvanan bi dilxweşî di cî de hat dîtin. Ji rêxistina Radde Barnet (Rêxistina Zarokan) jî daxwazên bi vî rengî hatin kirin.

Hemû rêxistinên Kurdistanê Iraqê di 19'ê mehê de belavokê bela kirin. Di belavokê de piştî informasyona di der heqê jenosîdê de, ji hemû partî û komelên Swêdî û nevnêwî, ji hukûmeta Swêd, ji



Bîstek ji mitînga Londonê ya li dijî qetlîama Helepçe

Rojeva Mehe

Siwarê hespê xelkê tim peya ye

Di meşa Stockholmê de ku li dijî qetliama Helepçê çêbû, nûçegihanê Armançê teypa xwe dida ber devê kîjan Kurdî, gazina li ser bîden-giya dewletên cihanê û rêxistinên navnetewî yên aştxwaz û demokrat dibihîst. Çi mêr û jinên navsere bin, çî jî keç û xort bin, berî her tiştî peyva ku ji devê wan derdiket ew bû ku, "çima dinya bêdeng e, vê êrişê hov û dirrinde protesto nake, çima ber bi hewara Kurdên bêguneh ên Helepçê ve naçe".

Bi rastî jî, gava mirov bala xwe dide rewşa cihana îroyîn gelek êşkere dixuye ku li gor çûyina ber bi hewara li hember hov û harîtiyên Afrîka Başûr, Amerîka Latîni yan jî ya Filistin, çûyina ber bi hewara Kurdên Helepçê gelek qels'e. Helbet sedem ne ew e ku hovîtiyên li Helebçê û li tevayîya Kurdistanê tên kirin, ji yên din kêmtir, an hindiktir in.

Sedem, yek jê ew e ku, di dinya me ya îroyîn de, mesela mafê mirovan û mîletan her çiqas bi firehî ber bi pêş hatibe jî, lê dîsan dewletên dinê, rêxistinên netewî û navnetewî dengê xwe li gor mafên xwe û siyaseta xwe bilind dikin, reng û tona dengê xwe li gor vê diguherin. Ev êşkere ye. Em jî û her kes jî bi vê yekê dizanin.

Lê gelo, di vê yekê de kêmasî û êşên me jî nabin sebeb? Qetliama Helepçê, carek din ev rastîya tal û tûj di çavê me ra kir ku, ji sedemên dengnekirin û protestonekirinê yek jê jî em bi xwe ne.

Roja qetliama Helepçê rû da, berde xelkên cihanê, me Kurdan bi xwe jî nizanibû ku çî bi serê Helepçeyîyan de hatiye. Me hinekan got qetliam roja 15'ê Adarê, hinekan jî got roja 17'ê Adarê pêk hatiye. Carekê me got 3 hezar, careke din me got 5 hezar û careke din jî me got 8 hezar Kurd hatine kuştin.

Tu ajansê me ya xurt tunebû ku roja roj, rastîya Helepçê, êş û birîna Helepçeyîyan pêşberî raya cihanê bike. Dezge û rêxistinê me ya netewî tunebû ku zû bi zû xwe bigihîne dewlet û rêxistinên navnetewî û li ser esasê mafên milî yên Kurdan meselê jî wan re şîroveke, bide xuyakirin ka gelo çî bi serê Kurdan hatiye û Kurd çî dixwazin. Dezge û rêxistinên me yên xudan têkilî bi dezge û rêxistinên cihanî re tunebû ku film an wêneyeke vê hovîtiya dirrinde ne pêşberî televizyon û rojnaman bike, hewara Helepçeyîyan, bi xwe bigihîne gelên cihanê.

Xwedêgiravî li ser navê me Îraniyan telefonî ajans, rojname û televizyonên cihanê kirin, wan bi imkanên xwe, ew birin ser qetliama Helepçê. Televîzyona Îranê, ajansên Îrani film û wêneyên gihandin ajans û rojname û televizyonên derva. Loma jî, helbet li ber çavê gelên cihanê, hewar, pirtir bû hewara Îraniyan, daxwaz, pirtir bû daxwaza Îraniyan. Dewlet û ajans û rojname û televizyonên dinê jî qetliama Helepçê kirin bûyerek ji bûyerên şerê Îranê û Iraqê, di çarçewa vê yekê de li meselê nihêrtin û reng dan beyanên xwe. Hewara Helepçeyîyan û ya Kurdan, bi serê xwe derneket holê.

Ev bi salan e ku em Kurd behsa "otorîtek netewî ya Kurdistanî", Konsey, Kongre, an cepheyek Kurdistanî dikin. Lê mixabîn me di vî warî de gavek pêşde neavêtiye. Loma jî gava felaketek bi serê me de tê, em nuh li xwe vardiqilin, lê dest û piyên me girêdayî dimînin. Em serê xwe li vî kevirî, li wî kevirî dixin, lê bê fêdeye.

Divê her Kurd, her rêxistin û partiyek Kurdî, baş bizanibe ku, em îro bi karekî wiha, bi avakirina dezgeyên milî ranebin, sibê dîsan emê serê xwe li keviran xî, lê wê bîfêde be. Bêsebeb nehatiye gotin ku "siwarê hespê xelkê tim peya ye".

Îfada M. Şêxmûs Cibran
"HEGER EZ CAREK DIN BIHATAMA DINYAYÊ
EZÊ DÎSA JÎ BIBÛMA ŞOREŞGER"

3

"Li ku derê kedxurî hebe, zulm hebe bi metodên
ilmî tespîtkirin û bişaftina wê vatiniya me ye"


Ji esra navîn û vir de hemû Afrîka ji alî welatên jê pêşdetir ve ku ew ji alî sanayî, tîcarî û kultur hîn pêş ketîbûn marûzê êrişê bû. Gihaştina teknolojiyê ya merhelek gelek pêş, firehbûna saha ticaretê û piştî ku ciyê gemiyên bi yelken (keştiyên bi yelken) gemiyên bi buxar girtin ev qita tu dibê acêb (mezin) ji alî gelek welatên emperyalîst-kapîtalîst ve hat îlhaqkirin. Kirin mustemleke (kolonî), li hemû dewlemendiyên bin erd û ser erd xwedî derketin, merivên wan bi salan li Ewrûpa, li Amerîka û li hemû bazarên cihanê wek kolan hatin firotin. Ev hemû wê çaxê kirinên ne mirovî bûn ku li ser navê "medeniyetê" dihatin kirin. Di roja îro de hinekan li dijî kolonyalîzmê serî hildan û dûre serxwebûna xwe ya aborî siyasî girtin û yên din jî ji bo serrastkirina tehrîbatên berê, xebatê dikin. hinek jî, li gel ku serxwebûna xwe ya siyasî bi dest xistine îro gihîştine serxwebûna siyasî.

Serxwebûnek siyasî ya rastîn, serxwebûna aborî jî ihtîwa dike. Îcar bi vacayî neserxwebûna aborî girêdayîna siyasî jî bi xwe re tîne. Lê hin serxwebûna aborî bi dest nexistinê. Û hîn rewşa xwe ya nîvkolonî muhafaşe dikin. Ji vana li Afrîka Başûr di dawîya sedsala 20'an de reşîkên ku % 80'ê nufûsê tînin meydanê, hîn hebûna wan tê înkâr kirin û mafên wan ê herî demokratîk û mirovî nayê nas kirin. Ez van mînakên basît li ser îddîa mudeîumên leşkerî ku hebûna Kurda înkâr dike û dibêje ku ew ji qewmekî Tûranî ne, didim. Rastî qet tu wextê ne hebûna ehlê cî yê Amerîka û ne jî reşîkên Afrîka dikarin înkâr bibin. Xwediyên welatan û medeniyetan esas ew in. Wek şoreşgerê, wezîfa me, divê em li hember ew kesên ku dixwazin netewan, medeniyetan û zimanan wenda bikin, bisekinin û ji bo parastin û pêşde birina van mueseşsan bixebitin.

Bi derketina civata çîneyî kedxurî peyda bûye. Li ku derê kedxurî hebe, zulm hebe bi metodên ilmî tespîtkirin û bişaftina (helkirina) wê vatiniya (wezîfa) me ye. Eksê wê, xemsarî û bêberpirsyarî ye. Loma jî Kurd ne qewmekî Tûranî ne. Milletekî serbixwe yê xwedî zîmanekî cihê, adetên cihê, kultur û rabûn û rûniştinek cihê ye. Zîmanekî wanê dewlemend heye. Li hember asimilasyon û jenosîden deh salan ev zîman û kultur neheliyaye, bi xurtî li ser nigan(piyan) maye. Ku wek yên eksê vê îddîa dikin jî bawer nakin, ku zîmanê Kurdî jî Farişî, Erebi û Tirkî hatibe meydanê. Elifba Kurdî jî yên Erebi, Farişî û Tirkî pirtir cihê ye û ji 32 herfan çê bûye. Zîmanê Kurdî ne ji grûba Ural-Altay e, ew ji grûba zîmanê Hindu-Ewrûpa ye. Ya din jî Kurd, ne ji Irqê (regez, nijad), Tûranî, lê ji irqê Arî ne. Û xwediyê medeniyetên Mezopo-

tamyayê yên herî kevn, herî bi kok in. Îro li gelek welatan; li mektebên Swêd, Fransa û h.w.d. beşên Kurdolojiyê hene, enstîtuyên Kurdî yên bi serê xwe mewcûd in. Bi kurtayî, li ser esasê înkârê berpêveçûna mesela Kurdî, ji bo xwediyên van îddîana dibe fena mese-la çûka devê, serê xwe dikin bin qûmê, rastiyê nabînin û ya jî naxwazin bibînin.

Sultan Silêmanê Qanûnî di sala 1425'an de di mektûba xwe ya ku ji Qiralê Fransa Françoisê 2'an re şandibû de, pirtir pesnê xwe dida ku xwediyê Kurdistan û Diyarbekrê bû. Ev belge di îlawa rojnama Milliyet de derketiye, li ba me hazir e. Cardin, di kovara Saçak hejmarê Nisan a 87'an de (ji 39) li ser Kurd û Kurdistanê hinek belge hene. Vana: ji Nutqê, ji zebtên celseyên dizî yên Meclîsa Tirkîyê (TBMM), ji axaftin û beyanên Atatürk, ji telgraf û tamimên wî tînin meyda nê. Û ez bawer dikim ku wexta arşîvên dizî yên Meclîsa Tirkîyê vebin wê hîn bi hezaran belgeyên (wesîqeyên) wisa derkevin ortê û ev belge ji bo tîgihîştina hîn baştir a dîroka me wê ronayîyê bidin. Di vê kovarê de ew hejmarê ku qala wê tê kirin, di zebtên celseyên



karên îdarî dibin."

"Navê lê tê kirin çî dibe bira bibe, bi rastî di wî welaî de ku wê bibe mustemleke, qet Kurdek jî tuneye ku bixwaze rewşa xwe biguhere, derbasî cinsiyeta dewleteke din be."

Rastî ne ew e. Rastî hatiye tahrîfkirin. Înonu wek nunerekî Kurdan neçûye Lozanê. Bi entriqayên cur be cur vê Peymanê, li Lozanê, Kurdistan kiriye çar perçe. Wek li vir jî tê dîtin, ev rastîya Kurd û Kurdistanê hemû serekên dewleta Tirk qebûl kirine, lê mudîmûmên (savci) leşkerî hîn qebûl nakin û Kurdîyê û qebûlkirina rastîya Kurdistanê hîn sîc dihesibînin. Ev ne dîtina rastiyê ye. Înkara ilm e. Heta îro ew îstatîstîkên ku hin salan jî alî Enstîtuya Dewletê ya îstatîstîkê ve hatine çekirin li gel hemû nehiştin, nenivîsandin, hîle û xurdan cardin jî her carê 2,5-3 milyon merivî li ser axa vî welaî, xwe Kurd nivîsandiye.

Gelê Kurd bi hezaran sal berê, li ser ev axa ku îro jê re Kurdistan tê gotin civakên bi îstîkrar pêk anîne. Mîratxwediyê Medeniyeta Mezopotamya yên herî kevn, herî bi kok in. Di dema Împaratoriya Osmanî de, di Gulana 1639'an de bi Peymana Qesrî Şîrîn ku di dîrokê de wê wek rûşeyîyê bimîne, Kurdistan di nav Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Sefawî ya Îran de du bûye perçan. Di dîrokê de ev perçebûn, di eynî wextê de destpêka mustemleketiya (kolonîtiya) Kurdistanê ye. Li dijî kedxurîya kolonyalîzmê û li dijî talanê, gelê Kurdistanê bi salan li ber xwe daye. Van tîkoşînên ku li hember Împaratoriya Osmanî û Îranê hatine dayîn perçakî dîroka Kurdistanê tîne meydanê. Hemûyên van liberxwedanan jî alî van împaratoriyan ve bi hovîti hatine şikandin. Li hember îşxalên ordiyên Rûs gelê Kurd bi eqaliyetan re li hember hêzên îşxalkar bi qehremanî şer kiriye. Lê di pê re burjuwaziye Tirk ê nijadperest û soven pêşengiya şoreşê girt destê xwe, çî daxwazên sinifî yên tebeqên cur be cur be û çî jî ew qadro û rêxistinên ku daxwazên netewî û demokratîk ên eqaliyetên ku li dijî îşxalê şer kiribûn dianîn zimên bi hewakî bê aman îhma û belav kir.

Dûmahîk di hejmarê bê de

Wek şoreşgerê,
wezîfa me, divê em li
hember ew kesên ku
dixwazin netewan,
medeniyetan û zimanan
wenda bikin, bisekinin

Meclîsa Tirkîyê yên bi dizî de, di beyan û axaftinên Atatürk de, di axaftina Îsmet Înonu de ku li ser navê Tirkîyê di Konferansa Lozanê de kiribû de, di bûyerên Konferansa Erzeromê de, di Protokola Amasyayê de, di Nizamnama Cemiyeta Anadolê ya Mudafai Hukûq de, tu carî hebûna Kurdan nehatiye înkarkirin. Bê şik hedîse bi dîtinên cihê cihê hatiye îzahkirin. Û rastîya Kurdistanê tim tahrîf bûye. Lê belê rastîya ku tê jiyandin bi temamî tişteki din e. Mesele, Înonu di belavoka ku di Konferansa Lozanê de xwend de (Konferansa Lozanê ya Aştiyê, tutanaklar, belgeler takim 1, cild 1, s.348-349) digot, "Hukûmata Meclîsa Tirkîyê bi qasî ku ya Tirka ye hewqasî jî ya Kurda ye".

"Gelê Kurd û nûnerên ku li jor navên wan derbas dibin ne razî ne ku birayê wan ên ku li wilayeta Mûsilê rûdinên ji Tirkîyê biqetin."

"Kurdan hertim li Tirkîyê ji mafên însanî feyde dîtin. Ji alî siyasî û sosyal ew hukûmata Tirk ku pê re hevkarî kirine qet tu carî wek hukûmetek xerîb nehesibandine. Di Meclîsa Mîlet de nûnerên wan hene. Û bi aktîfî tevî

Adresa tîkîlî û naman: P. O. BOX: 240 12
750 24 Uppsala/Sweden.
Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0384 7385

Şertên Abonetiye:
Salek 120 Skr, 30 DM.
Şeş meh 60 Skr, 15 DM.

Xwedî/Issued by
Yekîtiya Karkerên Demokratên Kurdistanê
The Democratic Union of Kurdish Workers

Bajarê şîrîn û têkoşer: Helepçe

Bavê Zamwa*

Navê Helepçe ji ku hatiye:

Ji ber girîngiya cihê coxrafi ya bajarê Helepçe ji kevin da ye ku bi navê "Heleba Piçûk" hatiye binavkirin. Ev nav ji bazirganiyê tê, Helebçe ji wek Helebê qonaxek girîng a bazirganiyê bûye.

Cihê coxrafi yê bajarê Helepçe:

Bajarê Helepçe dikeve jori rojhelata Iraqê û rojhelata bajarê Silêmaniyê û ji Silêmaniyê 76 km dûr e.

Nifûsa bajêr:

Nifûsa bajêr heta sala 1974 digihîste 60-70 hezarî. Lê piştî ku rejîma xwînmij a Iraqê dest bi veguheztina (surgûnkirin) xelkê gundên dor û berên bajêr kir, piraniya xelkê gundan ketin nav cergê bajarê Helepçe. Hingê nifûsa bajêr gihîşt 130-150 hezarî.

Şol ûkarên xelkê:

Her ji berê ve ye rûniştvanên xelkê bajêr bi kar û barên çandiniyê ve mijûl in. Li vê dawiyê xort û ciwanên bajêr di xwendinê de gihîştine pileyên (derece) bilind û di nav kar û barên dewletê de kar dikin.

Nêzikî 28 xwendegên serataiyî (xwindegêha destpêkê) yê kur û keçan di nav bajêr da hene.

Disan 5 xwendegên navincî û amodeyî û xwendegêha amadeya pişesaziya kur û keçan lê heye. 5 nexweşxane û dermanxane jî li bajêr hene.

Bajarê Helepçe bi navê bajarê şairan bi nav û deng e. Çendek şair û nivîskarên mezin ên Kurd tê da ji dayik bûne û di nav hembêza wî da mezin bûne. Mîna Ehmed Muxtar Caf, Tahir Begê Caf, Goranê nemir û Mewlewîyê mezin û her wisa çendin nivîskar û şair ji gundên li dor bajêr derketine, mîna Taweguzî.

Di sa çendin seyrangehên dilveker û pirr xweş li dor û berên bajêr hene, wek Ehmed Awa û Zalim, Bîyare û Tewêla bajar ji ali baxçe û bîstanan gelek dewlemend e û ji bo çandinê li ser axek pirr baş e.

Dewir û karên hêja yê xelkê bajarê Helepçe di şoreşa Kurdî da:

Rûniştvanên bajêr di pirraniya şoreş û serhildanên gel de beşdarî kirine û gelek qurban ji dane. Di sala 1961'ê de dema şoreşa Kurdî dest pê kir, gelek xort û lawên bajêr çekên şeref û serbilindiyê li dijî hukûmeta helperist a Abdulkerîm Qasim de hilgirtin û ber li leşker û firokên hukûmetê girtin, her ji ber hindê hemî dema hukûmetên genî zulm û tadeyeka mezin li xelkê bajarê Helepçe kirine. Di sala 1961'ê de firokên hukûmetê bajar û gundên dor û ber da ber topan. Di sa sala 1974'a rejîma faşîst a Bexda bajar da ber nâpalm û nêzikî 200 kesî kuştin û birîndar kirin. Bi dehan xanî û

malên bajêr wêran kirin. Xelkê bajêr beşdarî di pirraniya xwe-pêşandanan kirine. Di sala 1987'a de hukûmeta hov a Bexda di sa bajar bombebaran kir û taxa Kaniya Aşiqan da ber topan û bi buldozera sero-bin kir û di encama wê êrişê de 50 kes hatin kuştin û birîndar kirin. Her wisa sitemkarên faşîst birîndar gîş ji nexweşxanan derxistin û bi saxî veşartin û bi vî awayî hejmara kuştîya gihîste 85 kesan.

Xelkê şoreşger û qehremanê bajarê Helepçe her dem xebat û bizavek mezin kirine. Lewra bi dehan hatine bi darvekirin û bi dehan di nav rêzên şoreşê da şehîd bûne. Her ji ber têkoşîna berdewam, hukûmetê bi çavekî pirr hov û nemirovane temaşeyî xelkê jehatî yê bajêr kiriyê û çendin pîlan ji bo rehêlan wan darêjtine heta gihîste îsal ku di roja 16.3.1988 bi dirindeyî bajar dan ber topên kimyayî û bi deh hezaran şehîd û birîndar bûn.

Hezar silav ji bo canê paqij ê şehîdên bajarê Helepçe û gîşê Kurdistanê.

Mirin û serşorî ji bo faşîstên Bexdayê û yê hemû cihanê.

Hêvîdarim ez karibim vî bajarê xweragirtî bi xelkê welatê xwe û cihanê bidime nasîn.

(* Bavê Zamwa ji xelkê Helepçe ye, û nuha li Eskilstunayê dimîne.

Hin ji çekên kimyayî yê li Helepçe hatine bikaranîn

Gaza Xerdelê (Senap): Di sala 1886'an de ji aliyê kimyagerê Almanî Vicktor Meyer ve hatiye îcatkirin.

Bê reng e. Pirr bi tesîr e. Fonksiyona organa bîngirtinê tavilê wenda dike. Ji bo vê yekê meriv nizane bîna wê çawa ye.

Di wextê gelek kin de ji cilan derbasî çerm dibe û birînen gelek xeder vedike. Dermankirina van birînan gelek zahmet e. Ji çend seetan şûn de eş destpêdikin. Bi destpêkirina eşan re birîn mezintir dibin.

Bi tesîra vê gazê pişik dişewite, çav diwerimin. Wexta kubi dozajê (miktarê) zêde be, dilê mirovan li hev dixê, mirov vedireşe û çermê mirovan dişewite. Ji bilî van tesîran, wek şokê, gelek tesîrên vê gazê yê din jî hene.

Awayê rohn vê gazê hîn bi talûketir e. Tesîra gaza senabê bi heftan ji erdê ranabe û zû ji mirovan derbasî mirovan dibe.

Gaza Sinîr: Bê reng e. wek gaza senabê meriv firsatê nabîne ku bîna wê bigre. Tesîra xwe zû dide xwiyakirin. Tesîra herî mezin li ser pişikê dike. mirov nikare bihna xwe bide bistîne û her ku diçe bihgirtin jî zahmetir dibe. Ronahiya çavan xerab dike wek tim li, ber çavên meriv mij be û ji çavan hêşir tîne. dilê mirovan li hev dikeve û bi tesîra vê gazê mirov zikêşî (emel) dibe.

Ew, him wek gazê û him jî wek rohn tê bi karanîn. Di herba Cihannê ya yekem de Almanan bi kar anî. Cara duduya di sala 1936'an de li Etopyayê û dûre jî li Lîbyayê Îtalyanan bi kar anî. di sala 1960'an de Misirê li Yemenê bi kar anî. dure DAY'ê li Yemen û Vietnamê bi kar anî. Ji sala 1984'an vir de jî Iraq li Kurdistanê bi kar tîne.

Bi gelemperî li ser çekên kimyayî û bi taybetî jî li ser yê ku li Helebçe hatin bi karanîn me hevpeyvînek bi Dr. Bahram Resûl re çêkir, nivîsa wê di hejmara bê de.

Newroz bi xemgînî û qerardarî hat pîrozkirin

Newroza îsal bi şînek giran, bi xemgînî derbas bû. Êriş a Iraqê ya bi çekên kimyayî ya ser Helebçe, kuştina bi hezaran Kurdên herêmê di dilê her Kurdekî welatparêz de birînek teze vekir. Newrozê îsal bi pirranî bûn protestoyên li dijî rejîma xwînmij ya Saddam.

Li Kurdistanê Tirkîyê, şert her çiqas dijwar bûn jî, di sa têkoşerên gelê Kurd bi awayên têvel Newroz pîroz kirin. Du hefte beriya Newrozê heta heftekê piştî Newrozê, leşker, polis, sîxur û her reng çasên dewletê yê li Kurdistanê di alarmê de bûn. Di gel van tedbiran, di sa agirê Newrozê hat vêxistin, afîş bi dîwaran ve hatin zeliqandin, pankart hatin vekerin, belavok hatin belavkirin.

Li gelek bajar û herêmên Kurdistanê belavoka ku ji aliyê Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan û Rizgarîxwazên Netewî yê Kurdistan-Meyla Sosyalîst hatibû derxistin, hat belavkirin. Rojnamên Tirk di sa wek carên din bi zanebûn navê her du partîyan jî çewt nivîsnadin. Ji bo PPKK, PKK, jo bo KUK-SE (Rizgarîxwazên Netewî yê Kurdistan-Meyla Sosyalîst jî Rizgarîxwazên Netewî yê Kurdistanê-Îlmên Sosyalîst nivîsandibûn. Li Stembolê di seriya 100 xwendevan û karkerên Kurd di salonekê de bi



Newroza 1988'an li Qamişloyê bi girseyî hat pîrozkirin. (Foto: Armanç)

dizî şevê Newrozê amade kirin. Li gor şertên îlegal, programa şevê gelek dewlemend bû.

Li Kurdistanê Suriyê îsal jî Newroz bi girseyî ji aliyê tevayîya xelkê ve hat pîrozkirin. Lê îsal li Qamişlo û li deverên din ên Kurd lê dijîn -bêyî Şamê- di programên Newrozê de bikaranîna sahne û mîkrofona qedexebû. Ji ber vê çendê li gor par û pêr îsal, programên Newrozê melûl, ji ber vê çendê jî xelk hinekî dilşikestî bû.

Li Ewrûpa, wek me li jor jî got ji ber bûyera Helepçe Newroz bi şîn derbas bû. Li Swêd: di 18'ê Adarê de li Goteborg û Uppsala, di 19'an de li Stockholm, di 20'an de li Umeo û Eskilstuna û di 25'ê Adarê da jî li Sundsvallê şevên Newrozê hatin çêkirin. Şeva herî dewlemend

û bi girseyî ya Stockholmê bû.

Li Almanya Federal: Berlîna Rajava (çar şev), li Bremen (du şev), Hamburg, Duisburg, Nürnberg, Köln, Stuttgart û li gelek bajarên din şevên Newrozê hatin çêkirin. KOMKAR bi anîna Aramê Tigran şevê xwe hîn dewlemendtir kir. Şeva KKDK a Kolnê bi dengbêjên amator gelek dewlemend derbas bû: Ronak Gohdar, Rûken, Gulîzar, Bêrtî, Baran, Reşo li hember 1200 temaşevanî li dû hev, stranên yek ji yekê xweştirgotin.

Li Londrayê, Lozanê, Atîna, Kopenhagê û çî bigre li her ciyê ku Kurd lê hene şevên Newrozê hatin çêkirin.

Qetlîama 16'ê Adarê hat protestokirin

Roja 16'ê Adarê 2000 xwendevanê Unîversîta Stembolê bi mitîngeke korsanî û li dor 1000 xwendevanî jî, di sînemakê de bi panelekê, qetlîama faşîsatan a 10 sal berê protesto kirin.

16 Adar 1978: Faşîst, li ber derê Fakulteya Huqûqê ya Unîversîta Stembolê bombe avêtin ser xwendevanên huqûqê, dû re jî bi reşayên otomatîk ew gulebaran kirin; 7 xortên şoreşger şehîd ketin, bi dehan kes birîndar bûn. Di nav van şehîdan de xortekî Kurd ku bi eslê xwe Sêwregî, hebû; Hemît Akil. Hemît milîtanekî PPKK û yek ji endamê aktîf ê rêxistina ciwanên Kurd, DDKD'ê bû. Herçiqas beriya hedîsê bi çend rojan polis di derheq haziriya qetlîameke bi vî rengî îstixbarat stendibû jî lê tu tedbir nestendibû. Di ser de polis û notirvanên her roj li ber derî bûn jî xwanê nedikirin.

16 Adar 1988: 2000 xwendevan li ser tedbirên polis ku li şûna qetlîamê û bi tevayî der û dora Unîversîta Stembolê girtibûn, li Lalelî civiyên, sloganên li dijî wê qetlîamê avêtin û meşiyên. Di gel mudaxela polis, xwendevanan meşa xwe qederekê domandin, lê polis muwafiqê girtina çend xortan bû. 'Eynî roj li sînemayeke Stembolê jî hin rewşenbîr, xwendevanên kevn yê ku qetlîama 16'ê Adarê jiyabûn û tevî 1000 temaşevan li ser vê qetlîamê panêlek-çêkirin. Di panelê de hat gotin ku: "Yên li dîwaran slogan nivîsandine di hundir de ne, lê yê qatil in li derve serbest dijîn".



Bîstek ji panêla Stembolê ya li ser qetlîama 16'ê Adarê

Înformasyon Çi ye?

Lewend FIRAT

Di avakirina raya giştî de di nava babetên nûçeyên (xeber-rên) rojname de înfomasyon ciyekî girîng digre. Ji ber ku înfomasyon bi tiştên nuh, yanî bi faktên (delîlên, rastî yên) nuh mirovan agahdar dike û zaniyariyek nuh dide wan. Li ser van faktên nuh meriv dibe xwediyê fikrekê û fikrek nuh derdixe ortê.

Înfomasyon gotinek latîni ye (Di latîni de informatio tê mana agahdarkirin, ronahî kirin, îzahkirin û zanyar kirinê).

Wexta ku nûçe (xeber) bi agahdariyên nuh merivan agahdar bike, wê gavê dibe nûçe. Ew tiştên nuh jî bi rastî û delîlan ve girêdayî ne. Bi awekî basît meriv dikare rojnamevaniyê wisa formule bike: rajname- nûçe -xwendevan.

Her rojname pêwîste ku tiştên nuh binivîsîne. Bêyî înfomasyon, bêyî îzahkirin rojname tune ye û eger hebe jî ew ne rojname ye.

Ev tiştên nuh, yan jî fakt çi ne? Bi bawerî û dîtînen pisporan, tiştên ku xwendevan nizanin jî bo xwendevanan nuh in, yan jî fakt in. Lê belê ev "nezanî" jî bo hemû ferdên civatê ne wek hev in. Yan jî bi gotinek din, pîvana "nezaniyê" jî bo her kesî ne wek hev e. Mesela, em bibêjin li dora bajarê Diyarbekrê kela (beden, birc, sûr) heye. Ev tişt jî bona Kurdekî Îranê, yan jî ji bo Kurdekî Iraqê, dibe ku jî bo Kurdekî Meletiyê jî sedî sed nûçe be. Lê belê jî yekî Diyarbekrî, yan jî jî bo ew kesên ku dizanin li dora Diyarbekrê kela heye ev, faktek e. Ji bo wê jî sinorê di navbera "zanînek bi tevayî" ne zanînek bi tevayî" bi şert ve ûbi hereket ve tê guherandin.

Wê çaxê meriv dikare bibêje ku nûçe; ne tiştên ku bi "tevayî zanayî", yan jî "bi tevayî nezaniyê" ye, û ew faktên ku tînin gotin divê her kes bi wan nizanibe û her wisa divê ev fakt ne bê bingeh bin.

Nivîskarê Sovyetî N. Poliguov bi awekî firehî li ser gotina înfomasyonê disekinê. N. Poliguov wisa dibêje: "Her bûyer, bi awekî kin yan jî dirêj, bi zimanekî bedew yan jî bi zimanekî xerab bînin nivîsandin, bûyer kevî bin yan jî nuh bin, jê bê bawerkirin yan jî nehê (neyê) bawerkirin, bi awekî firehî bînin gotin yan jî bi awekî kurtî bînin gotin, bi feyde

bin yan jî bê feyde bin, pêwîst be yan jî girîng be, hatibe zanîn yan jî hatibe fahmkirin" ew tiştên ku tînin belavkirin û bi wan bûyeran meriv tînin agahdarkirin, pêwîst e ku mirov jî hemûyan re bi adilî înfomasyon bibêje.

Xurtbûna nûça rojname di faktên nuh ku bi ajîstasyon tînin kirin de ye. Rojname bi ajîstasyonê xwendevanên xwe agahdar dike û kovar jî bi propagandê.

Her roj jîyan bi fakt û bûyarên bê hesab ve tije ne. Di dinyayê de tu rojname, tu radyo, û televîzyon tuneye ku ew tiştên di rojekê de dibin karibe hemûyan binivîsin, yan jî biweşînin, nişan bidin. Ev ne mumkûn e. Di vî warî de hîlbijartin mûheqq e. Û pîvana hîlbijartin nûçan (xeberan) jî îdeolojîk û politîk e.

Di vir de pêwîst e ku di navbera nûça rojname û nûça sansansiyonê (qere-

Xurtbûna nûça rojname di faktên nuh ku bi ajîstasyon tînin kirin de ye.

Rojname bi ajîstasyonê xwendevanên xwe agahdar dike û kovar jî bi propaganda ye.

pere) de ferqek hebe. Sansansiyon, faktan û bûyarên bihawekî wisa dide ku, di nivîsandina wê de li ser xwendevana tesireke neditî dike. Her çiqas pisporên rojnamevaniya sansansiyon a burjuwazî dibêjin ku, "Heger kûçik bi insan bigre ne nûçe ye, lê belê insan dev li kûçik ke wê çaxê ew dibe nûçe. Lê disa jî sansansiyon û nûçe ne wek hev in û ne jî yek tişt in.

Înfomasyon di agahdarkirinê de helqeyek wisa ye ku, pêwîst e karibe xwendevanan "şîyar" bike. Navaroka ku agahdarkirinê ihtîwa dike, jê re dibêjin nûça (înfomasyon) potansiyel. Lê pîr caran înfomasyon potansiyel nabe înfomasyon reel. Înfomasyon potansiyel a

ku naveroka wê agahdarkirinê ihtîwa dike û jî alî xwendevanan ve tê îdrakkirin, yan jî tê "qebûl kirin" jê re dibêjin nûça (înfomasyon) reel.

Wê çaxê rojnamevan çawa kare nûça potansiyel bike nûça reel û tesîrekê li ser xwendevanên çêke ku xwendevan wê "qebûl bikin".

1-) Aktuelî û zûbûn: Di tercûba jîyanê de gelek kes bi vî tiştê jê dizanin: yekcarîna di wexta îstîrahatê de bê hemdî meriv rojnamek bi ber çavên meriv dikeve. Meriv radihêje wê û dest pêdike dixwîne. Feqet carekê çavê meriv li tarîxa rojname dikeve û dinêre ku ev rojname ya mehek berê ye. Wê gavê bala meriv hemû belav dibe. Meriv rojname jî dest xwe daneyne jî, lê belê navaroka rojname alaqa meriv jî alî psikolojîk ve kiriye sifir.

Aktuelî û zûbûn wek du xekekên zicirê bi hev ve girê dayî ne. Di agahdarkirina nûçê de zûbûn, di destxistina xeberan de zûbûn, di ras kirin û belavkirin xeberan de de zûbûn...

Nûça aktuel tavilê (bi carê de) li xwendevanan belavkirin şertên yekemîn e ku nûça potansiyel bikaribe vegere nûçeya reel. Ku ev nebûna, meriv nikarbûna rola masmediya di jîyana civakî de îspat bikira. Marks bela sebeb negotiye ku "Rojnamevani seranserî hemû demek bi heyecan digre nav xwe û stresek dramatik, hevalbendiya bicihatina diroka nujen(modern) dike. "(Marks, Engels cild, 1, rûp. 168).


2-) Lêkolînên fîzyoloji û elektro fîzyoloji îspat kirine ku, di mejiyê însanan de mekanîzmên wisa hene ku musada hemû tiştan nake. Û bêyî tiştên nuh û bi mana tu tiştên din "qebûl" nake.

Ewê ku nûçe dinivîsîne û dide rola "teşvîkvan" dileyize. Bi çî awayî wê li ser fikir û hisa xwendevanan tesîr çêke, ev berî her tiştî girêdayî navaroka agahdariyê ye.

Nûçe divê ku bîna xwendevan teng neke, wî aciz neke û divê her gav di nûçê de tiştêkî nuh hebe û zanyariyekê bide "muştariyê" (xwendevanên) xwe.

Şertên duyemîn e guherandina înfomasyon potansiyel bi înfomasyon reelê ew e ku zanyariyek nuh bide xwendevanên xwe û bi van înfomasyonên nuh bîna xwendevanên xwe teng neke û wan aciz neke.

Rojnamevan wextê ku tiştên nuh, nede xwendevanên xwe, ne pêwîst e ku qelema xwe bigre



Lawikê Berrîvanî

NE GUR E BIZIN E

Çîrokek Azîz Nesîn bi navê "Ax Em Kerno" heye. Bi qasî ku di bîra min de maye çîrok wisa ye:

Dibêjin berê, ker jî dipeyivîn û li gor wan, zîmanekî wan jî hebû. Li welatê xwe jî xwe re bi wî zîmanî dipeyivîn û dinivîsandin. Rojekê jî rojan birrek gurên har, devbixwîn êrîşî ser welatê wan kirin. Keran xebera êrîşa guran girtin; lê gotin ku, "Na, em jî vê xeberê bawer nakin, ma wê jî bo çî gurê êrîşî me bikin?" Her ku gurên devbixwîn nêzikayî li wan kirin, bi vê nêzikayê re bînin û hilma gurran jî bi ser wan ket, lê cardin jî jî xwe re gotin, "Na na, vana ne gur in û kî dibêje vana gur in ne rast e. Û însalah wê ne gur bin".

Di nabênê re demek derbas bû, guran bêtir nêzikayî li wan kir, dengê zûre-zûr û tepe-repa nigên wan hat, lê keran cardin gotin, "Na na, ne gur in... Her çiqasî durfê guran bi wan dikeve jî lê ne gur in..." Bi vî hawî jî xwe re av bi ber dilê xwe reşandin, xwe teselî kirin. Lê gurên devbixwîn jî hewqasî nêzikayî li wan kirin ku êdî bi çavên xwe jî didîtin; zanibûn ku erêê wan yên jî hember ve tînin bi rastî jî gur in. Lê jî ber ku jî dilê wan ne hat, nexwestin ji guran re bibêjin "gur", lema jî cardin jî hew re gotin "Na na, vana ne gur in, hebe tunebe tebanî (heywan in" din ên ku durfê guran pê dikevin..." Dawiya dawiyê gava ku guran xwe gîhandin wan û qîlên xwe yên wek şûra di kulêmekên (rahnên) wan de çik kirin êdî wê çaxê keran jî rastî fahm kirin û jî berêşa can gotin "Aaaa! ooooo! ziiii..." Û jî ber ku jî tîrsa zîmanê wan hat girtin, devê wan kilît bû, lema jî bes kanîbûn bibêjin, "Reaa! ewwww..." Yanî rast ew bûne. Lê wê çaxê jî hasil çûbû mûsil, êdî qîlên (diranên) guran di kulemekên wan de çik bûbûn.

Ê Kurdan jî bûyê ev mesele, gûren har çarhawêl dora wan girtine, qîlên xwe disûn ku wan jî hev zîfêl zîfêlî bikin; lê ew her dibêjin, "Na na, vana ne gur in..."

Û dema meriv dibêje, "kaka!" heger hûn ne qaixî (şevreşkî) ne divê hûn bibînin ku yên hûn di nav lepên wan de ne bes gur in û him jî gurên devbixwîn... Ew xwîna bi qîlên wan ve ku hîn hişk nebûye, xwîna birayên me ne... Divê em jî xwe ve tedbîrekê bigrin; ya na, kînga dilê wan bixwaze wê me bixun.

Ji van gotinan re bi dengêkî pîr hêdî (hema hema tu bigre bi dizî) îtiraz tê kirin, dibêjin "Na kaka na, vana ne gur in, yên gur, em bi wan re di şer de ne, vana bizin in... Û dixwazin li hember guran bi quloçên xwe alkariya me bikin..." Û çaxa meriv hinekî din îsrar dike û dibêje ne wisa ye, wê çaxê jî bi hêrs dibêjin "Heyran, heger hûn jî gotinên me bawer nakin, ma hûn jî rîya wan jî bawer nakin? Vana bizin in û lema jî bi rî ne..."

Wer xuya ye heya ku gur neyên qîlên xwe di kulêmekên me de çik nekin em nabêjin vana "gur" in... Lê piştî ku qîl di kulêmekan de çik bûn, em jî guran re bibêjin "gur" jî wê pîr dereng be...

destê xwe.

3-) Nûçe pêwîst e ku jî alîkî de bersivên lazîmatiyên objektîv û civakî yên xwendevanan bide û jî alî din de jî, wan bi wan tiştan tîr û "tatmîn" bike.

Îcar wextê ku rojnamevan û kolektîva rojnamevanan li ser meteryalên rojname raweste û wê bi kar bîne, pêwîst e ku van çar noqtan bîne ber çavê xwe. a-) hîlbijartina babetê, b-) hazîrkirina mewzyan, c-) bi awekî edebî

xemlanina wan û d-) redaktekirina wan.

Wazîfa rojnamevan tenê agahdarkirin a xwendevanan nîne, ew agahdariya ku dide xwendevanên xwe divê bi wê agahdariyê li ser şûr, psikolojî û jîyana civakî ya xwendevanên xwe tesîrekê çêke. Pîvana tesîra rojnamekê, ne bi înfomasyon potansiyel, lê bi înfomasyon reel ve tê qîmetkirin

Lêkolîn

Kurte bahsek di derheqê tiyatroya Kurdî û operêta "Dayika Nîştîman" de

Fexredîn Gerdî

Şanoya (tiyatroya) mirovxwazane her di roja peydabûna xwe de, bi navê yek ji babetên pêdiviya jiyana rojane ya xelkî hate nasîn û dewrekî her girîng û berbiçav li rêka xebata dijî çewtî û pirrşasiya û her wisa bûye çirayekî pirr geş ji boronîki rina rêka jiyana xweşiyê û serfiraziyê ji bo mirovatîyê.

Dema ku şanoya Kurdî ji peyda bûye, ev jî şanoyek bû di xizmeta mirovatîyê de. Belê, çaxa ku ev şanoye peyda bûye bi şanoya cihanê ve nebû. Pêşde di nav der û ciyên ayîne de serê xwe hilda û kete bin çavdêriya keşîşan ku wê çaxê bi navê mirovên rewşenbîr dihatin nasîn. Yanî şanoya cihanê berê di xizmeta çîn û qata burjuwa de bûye. Lê belê hêdî hêdî pêşveçûna kar û barên jiyane û berfirebûna xebatên hunerê şanoya cihanê ji rêkên cur bi cur girtin ber xwe û serencam ciyê xwe di nav gel de vekir.

Belê, eger em berê xwe bidin dîroka şanoya Kurdî, dê bibînin ku ev şanoya berevajîya şanoya cihanê bûye! Bo çî? Se xatirê vê çendê şanoya Kurdî di dewra peydabûna xwe de, hevçerx bûye di gel xebata gelê Kurd, li dijî dagirkerên Kurdistanê. Ango eve bi xwe egereke her mezin e bo vê çendê ku şanoya Kurdî her di roja destpêka xwe da di xizmeta çîn û qata jar û belengazên civatê de bûye û ciyekî bilind û pirr şanzî di nav gelê xwe de vekirîye. Her ji ber vê yekê ku em dibêjin şanoya Kurdî, şanoyeke mirovxwazane ye. Helbet şanoya Kurdî jî weke şanoya cihanê tûşî gelek girê û astengan bûye. Lê belê çî carî dest ji xebata xwe nekişaye û kariye bi başî xebata mîrxasane ya gelê xwe nîşan bide. Her ji ber vê çendê ye ku dibêjin "şano xwendîngeheke gelêrî ye". Çimkî bi rastî şano ye ku dera rastiyê, duristiyê û xweşiyê û xebatê nîşanî gel dide. Eve barê ser milê şanoyê ye ku diviya xweşî û nexweşiyên jiyane bi diristî nîşan bide. Şano divê di rêka serkeftina peyva pîroz û pirr vekirî ya mirovatîyê de xwedanê dirîşmeke (nîşaneke) şoreşgerane be...

Eve bi giştî heke em bixwazin di derheqê dîroka şanoya Kurdî de xeber bidin, reng e ev çende bi diristî bi me nehête kirin. Çimkî jî aliyekî ve hewcedariya gelek bahs û lêkolînan vê meselê heye. Ji aliyekî dinê jî ve serkaniyên ber mişeya mîjuyê, hewce ne heta ku ev çende ser bigrit. Ya rastî, heta îro jî dîroka pêşkêşkirina yekemîn şanoya Kurdî her ne diyar e. Yanî em bi diristî nîzanan ka sal roja ji dayikbûna dîroka şanoya Kurdî kinga ye. Ji ber vê çendê bîr û rayên cur be cur di derheqê vê meselê de hene. Bo nimûne di hindek çavkaniyan de piyesa "Memê Alan" a Abdelrahîmê Hekarî bi navê yekemîn şanonama li qelemê din ku di sala 1919'an de di kovara "Jîn" de li bajarê Stembolê hatiye çapkirin. Bi bîr û raya me Memê Alan çirokeke drama ya Kurdî ye, çimkî dirîşmên drama yê pê ve diyar in. Yanî em

nikarin bêjin ku di wextê xwe de nehatiye pêşkêşkirin, çimkî dibe ku berî sala 1919'an hatiye nivîsîn û wek tiyatroyekê hatiye listin. Eve jî tişteki diyar e ku şanoya pêşdayî nivîskaran dest pê nebûye. Çimkî eger wisa be hersê mercên pêkanîna şanoyê dê hatibana têk şikandin. Çaxê ku drama jî pêş edeba drama-yê serê xwe hildaye, yanî pêş peydabûna nivîskaran ew kurs û aktor bûn ku deqa şanoyê pêk anîn, ne ku nivîskar. Karê nivîskaran ev çende ye ku li ser bûyerake dramî bi curekî hunerî biafrîne. Her wisa ji aliyekî dîtir ve zor kesên şareza yê bizava şanoya Kurdî dibêjin ku "Yekemîn roja dayikbûna dîroka şanoya Kurdî vedigere sala 1922'an" yanî her li vê salê bûye ku şanonameyek bi navê "Qralîçe" li bajarê Sulêmaniyê hatiye pêşkêş-

li seranserê Kurdisatanê serî hildan, guriya bizav û xebata gelê me şûnwarekî berbiçav danî ser milê dilsoz û niştîmanperweran û ew gihan din vê çendê ku her bi tenê xebatên siyasî nînin ku dê karibin karwanê xebatê berewpêş bibin. Hunerên mina lavje û stran û govend û şano jî divê di vê xebatê de pişkdar bin û dengê rastiyê bigihînin guhên hemî gelên cihanê. Her piştî vê meselê bû ku hevçax di gel peydabûna komelela "Jêkaf" di 16 Eylûla 1942'an de li Kurdistana Rojhilat çend kes ji mirovên siyasî û evîndarên hunerê Kurdî bo yekemîn car di dîroka şanoya Kurdî de di vê pişkê de ji Kurdistanê dest bi kar kirin û di meha Adara sala 1945'an de "Tîpî Nimayîşî Kurdistan" li bajarê Mahabadê ku "Çeyxana Kerîm Cocco" lê bû bo xwe kirin oda nimayîşê



Operêta Rûbarî Jiyan, sala 1987 Hewlêr

kirin. Dîsan her wê salê şanonameyek bi navê "Colegey Kolgêr" ku ji nivîsîna şairê Kurd Şêx Selamî ye, wek dibêjin li ciyê geraca "eshabê spî" dîsa li bajarê Sulêmaniyê hatiye nîşan dan. Derheqê vê çendê de jî (ku bi rastî dîroka şanoya Kurdî ew çend şanoname ne) belê me çî delîl û belge nînin ku vê çendê bo me bidin diyarkirin. Helbet di van salên dimahiyê de jî gelek zana (pispor) şarazayên huner li duv vê yekê geriyane ku belgên rast û dirist derheqa vê yekê da peyda bikin, da ku bişên dîroka peydabûna yekemîn tiyatroya Kurdî pêraçînin. Cihê gotinê ye ku bêjin di salên 1983, 1984'an de nivîskarekî Kurd bi navê "Mehemed Bekir Teymûr" li şarê Hewlêrê çend şanoname peyda kirin, ku yek ji wan "Mîrê Dil" e ku di sala 1905'an û ya din jî di payîza sala 1921'ê de li bajarê Hewlêrê hatine pêşkêşkirin. Hêja M. Bekir Teymûr di gotbêjekê de di derheqê vê çendê de dibêje "herdu şanonameyên xwedan belge vê gavê di destê me da ne. Belê nuka wextê behskirina wan nîne".



Çaxa xebata azadîxwazane ya gelê Kurd reng û rûyekî şoreşgerî girt û gelek partî û komên cur be cur

dêstpêka dîwana xwe ya "Tarîk û Ron"ê de derheq Dayikî Nîştîman de dibêje: "Tiyatroya Dayikî Nîştîman" mezintirîn teblîx bû ku Komela -JînKaf- kir, ew tiyatroya ku gelek bi hêsanî hatibû çêkirin û dikarim bêjim ku ji aliyê huner û heta fikrî ve jî lawaz bû, bi midetê 3-4 mehan li Mahabadê û şarên din yê Mikriyanî hat nîşandan. Kêm kes hebûn ku neçûban dîtina tiyatroyê û ewên çûbûn jî li ber digiryan û evîna Kurdîyê di dilê wî de pirr geş dibû. Heta ji gundên dûrî bajarên jî xelk kom dihatin dîtina nimayîşê. Ji bilî teblîxatên siyasî, ji aliyê maddî ve jî komele dewlemend kir. Her bi xatirê desthata vê nimayîşê bû ku komele divê çapxaneyekê bikiret û li Mahabadê damezrîne". Her wisa mamostayê Kerîm Husamî di pirtûka xwe ya bi navê "Komarî Demokratî Kurdistan, yan xudmixtarî" de dibêje: "Ew nimayîşe yekemîn tiyatroya hunerî ya serkeftî ya Kurdî bûye, li hemû navçên azadkirî yê Kurdistanê". Vê Opereta Dayikî Nîştîman ev çende nîşanî xelkê daye ku, çawa Kurdistan

kêmasî jî hebûne, belê em diviya çu cara ewan kêmasiyan nexîne berçav. Çimkî hingê mustewa têgihîştina gelê jar û belengaz ê Kurd kêm bûye û tişteki hêja jî hatiye kirin; divê dîroka tiyatroya Kurdî her gav şanzîyê pê bike. Heke em çavên xwe li karê hunerî yê Kurdistana Başûr, piştî 1970'ê bigerin dî bibînin ku her çende seba pêşkeftina babetên hunerî li vî beşê Kurdistanê zor xebitîn, di vî barî de sergirtine, lê belê dîsa jî kêmasî tê de hebûne. Her ji ber vê çendê ye ku divê bêjin, ciyekî pirr hêja û bilind ê Dayikî Nîştîman heye. Belê derheqa peyva opera an operêta da li gelek cihan Dayikî Nîştîman bi navê Opera têt diyarkirin, bi bawerîya me ya rast ev e ku bêjin operêta, ne ku opera; çimkî ji ber gelek sebeban hêşt gelê Kurd negihîştîye vê qederê ku karwanê hunerî bikare operayan pêşkêş bike. Ji aliyekî dîtir ve opera ji çend operêta pêk têt, ne ku operêta ji çend opera pêk têt. Bi giştî salroja destpêka operêta Kurdî, li Kurdistana Rojhilat; operêta Dayikî Nîştîman bûye. Lê belê dîroka peydabûna vî hunerî, li Kurdistana Başûr, vedigere sala 1930'î operêta "Dilaweran" ji aliyê nivîskar E. Nûrî ve hate nivîsîn. Vê operêta bi xwe di bizava hunerê Kurdî de ciyekî bilind heye. Ji bilî vî karê hunerî çend nimûnên din, mîna "Gulê Xwînavî" ya Goranê nemir ku bi awazdanan û regîsoriya hunermendê nemir Refîq Çalak bûye. Cara pêşîn sala 1946'an, li bajarê Silêmaniyê û Hewlêrê hatiye nîşandan. Aktorên vê operêta jî ev bûn; "Heme Salih Dilan, Mehmed Mihemed Leylê, Ebdila Refîd Salar û Refîq Çalak, di gel çend hunermendên din". Helbet ev operêta çend carên din jî li ser şanoyê hatiye dîtîn. Piştî operêta "Gulê Xwînavî" karê hunerî di vî warî de kêm bûye, heta ku piştî sala 1970'yî careke din reng û rûyên berfirehtir xwe girtiye yanî Dr. Bedirxan Sindî operêta "Memo"yî nivîsiye û Nûreddîn Birahîm sala 1972'ya, awaz jê re dane û Nasir Hesen jî sala 1974'a bo televizyonê qeyd kirîye Her wisa navbera salên 1974-1978'an gelek operêta hatine pêşkêşkirin û ciyê wan pirr bilind e. Bo nimûne hunermendên Silêmaniyê dikaribûn ku pêşkêşkirina operêta "Kejaway Mêjû" di misabeqeyê hunerî de li bajarê Bexda xelata yekemîn wergirit. Her wisa sala 1978'a jî koma hunerî ya Hewlêrê şiya bi pêşkêşkirina operêta "Rûbarî Jiyan" xelata yekemîn li misabeqa Mûsilê wergrit. Wan karên hunerî bi rastî ev çende dane diyarkirin heke bêt û gelê Kurd serbixwe bibe, gelek hunermendên hêja di vî karê me de hene ku wê bikaribin babetên baştir jî pêşkêşî gelê xwe bikin. Li dumahiyê ciyê gotinê ye ku dîsa ew bêjin operêta Dayikî Nîştîman çirayekê pirr geş bûye bo nîşandana rêka gelê xwe, nemaze bo berfirehkirina şoreşê li Kurdistana Rojhelat. Bi rastî jî gelek di cî de ye ku bêjin karê hêja yê wan hunermendan karekî pîroz û pirr geş e, di bizava hunerî ya Kurdî de û ji bîra kesî jî naçe.

"Çi cara namirin evên ku di dilê gelî de dijîn".

perçe-perçe bûye û gelê Kurd çawa barê bindestiyê dikêşe û dijmin jî çawa tevin û pîlana ji wan re hazir dike. Vê operêta ev babete ji gelî re diyar kir ku çawa diviya destên hev bigrin û dijî dijminê dest bi kar bin û Kurdistaneke heveng û deng pêk bînin. Dîsa ji bo zanîna pirtir di derheq Dayikî Nîştîman min axaftinek di gel mamosta Husamî pêk anî ku bi kêfxweşî di vî warî de got: "Reng e ev nimayîş di wextê xwe de pirr kêmasî yê wê hebûne, lê belê ji bo wê wexta ku hatiye pêşkêşkirin gelek hêja bûye. Çimkî wê çaxê qedera têgihîştina gelê jar û bindest; Kurd her ew çende bûye..." Mamoste Husamî her weha dibêje: "Xelk zor ji gund û şarên Kurdistanê dihatin Mahabadê û ew nimayîş diditîn. Gelek ji xelkê çaxa ku çavê wan bi ciyê nexweş diket, li ber digiryan û li ciyê pêkenîne jî bi dengê bilind dikenîyan". "Nemaze dengê xweş ê hunermendê nemir 'Nehrî' ku aktor bû û hinek şîr di tiyatroya Dayikî Nîştîman de xwendin, xelk tanî girîn, rêka xebat û serkeftinê nîşanî gel dida. Ev tiyatroye li beşekî pîraniya bajarên Mukriyanê hate nîşandan û 3-4 mehan jî li ser sahnê ma; serkeftineka zor jî bi dest xwe ve anî".

Belê bi rastî jî, her çende, reng e vî karê hunerî ji gelek aliyan ve

26'ê Adarê... Seat 4'ê piştî nivro, li meydana Sergelstorgê, paytaxa Swêdê. Di bin barana buharê de, ji çar perçên Kurdistanê -mêr, jin, zarok law, keç keçêk- nêzî 3 hezar Kurd û dostên Kurdan civiyane. Di destê wan de resmên qatliamê û plakatek û nivîsên li dijî jenosîdê, di ruyê wan de kîn û nefret, bi yek dilî û yek canî bi dengê zelal û dilsoz dikin hewar û dibêjin "Kurdistan, Kurdistan solidarîtet" û "Faşîst Sedam Mordare" (Qetil Faşîst Sedam).

Belê wê rojê hemû Kurd di wexta xwe de hatibûn meşê. Birîn xedar û giran bû. Ne 50, ne 250, ne 550 di ser 5 000 rî re zarok û jinên Kurd, mêr û kal û pîrên Kurd ên bê gûne ji alî rejîma faşîst a Iraqê de, bi çekên ku ji xwe dêgriravî di dinya de hatibû qedexeyê kirin, qetl dibûn. Cîhan jî vê qetliema re bê deng mabû, Kurd gûnehkar- bûn(!).

Te digot qey meş û mitîng bi xwe hatibûn organizekirin. Ev mitîng ne wek mitîng û meşên din bû. Disiplîn hebû, organîze hebû.. Meş û Mitîng ji alî Federasyona Komelên Kurdistanê hatibûn organîzekirin û hemû partî û rexistinên Kurdistanê jî di meşê de hazir bibûn.

Berpirsiyarên Partiyên Swêdî, wextê di axaftinên xwe de rejîma Iraqê rûreş dikirin û pişgiriya xwe bi gelê Kurd re nîşan didan, axaftina wan ji alî meşvanan ve pîrrê caran bî şîara "Kurdistan, Kurdistan Solidarîtet" dihat birrîn.

Serokê Federasyonê K. Îzol di axaftina xwe ya Swêdî û Kurdî de wexta ku digot, "16 û 17'ê Adarê wê li ba Kurdan neyê ji bîr kirin" ji alî meşvanan, bi yek devî şîara "Faşîst Sedam Mordare" dihat avêtin. Deng di nav barana ku hurik hurik dibarî de li esmana bela dibû.

Di meşa heta Qonsuloxana Iraqê de, li kolan û kuçên Stockholmê şîarên "Kurdistan, Kurdistan Solidarîtet" û "Faşîst Sedam Mordare" olan dida. Rêxistin û partiyên pêşverû û demokratîkên Tirk, Ereb û kesên din ev olan hîn jî geştir dikin.

Li ber Qonsuloxana Iraqê meşvanan kîn û nefretê xwe bi şewtandina ala dijmin anîn ziman. Kevir avêtin Qonsuloxana dijmin û dijmin rûreş kirin. Bi saya polîsê Swêdî Qonsuloxana Iraqê ji destê meşvanan zor hat xilaskirin.

Di meş û mitîngê de, me jî ji meşvanan, dîtin û hisên wan li ser qatliam û hovîtiya rejîma Iraqê pirsî:

Emîna bermalî ya navsere wiha digot: Îro lazime destê me yek be, lazime aqilê me li serê me be, xelk henekê xwe bi me neke û em xwe nefroşin. Lazime em yek dest bin û xabata xwe bi hev re bikin û dilê me jî ji hev re bixawaze, em jî heqê xwe bistînin û Sedam Husên di bin erdê kin.

Di vir de wazîfa xwe dikim ku di nava alamê de haqê me wînda nebe.

Mahmûdê karker hisên xwe wiha dianî ziman: ez ji Kurdîstana Tirkîyê me. Ev qetliam ne tenê ku li Kurdî Iraqê tesîr dike, li hemû Kurdan tesîr dike. Îro ev tişt li Kurdîstana Iraqê çêbûye wê sibê li Kurdîstana Tirkîyê û li Kurdistan a Iranê jî çêbibe. Pêwîste ku em hemû zanibin dijminê Kurda kî ne.

Leyla bermalî jî wiha digot: hetajî destê min bê ezê pişgiriya Kurdên Iraqê û Iranê bikim. Ev qatliam e.

Mele Mihemed (teqawud) disoziya xwe bi peyvên jêrîn dianî ziman: Baas dixwaze netewê Kurd ji ortê rake. Dixwazin navê Kurdan ji dîrokê xirab bikin. Bi kuştin, bi sûtandin, bi derkirdin

Roportaj ji Ciyê Mitîngê

Li Dijî Hovîtî û Wahşeta Rejîma Iraqê:

"Divê em li xwe xwedî derkev"




Di mitînga Stockholmê de dora 3000 Kurd î bi kînek mezin qetliama Helepçê protesto kirin. Foto:Şoreş Zîrel

bi hemû tiştî dixwazin Kurd ji Kurdistanê rakin.

Ferhatê xwendevan digot: Êdî ev tişt dide xuyanîkirin ku ne tenê Iraq Îran jî her dixwaze miletê Kurd qetl bike. Kurdên ji çar perçan, ger li nav welat ger jî li dervayî welat, divê qeweta xwe

ji miletên din pîrtir tesîrê li me Kurda bike. Û ez êşa gelê Helepçe di dil û mêjîyê xwe de his dikim.

M. Salih Fîslî (karker) rastiyeke mezin dianî ziman: Qetliama Iraqê ne ji niha da ye, jî zûdeye tê kirin. Qatliama niha malxirabî ye û êrîşek faşîstîye. Pêwîste em li dijî wan bisekinin. Ez



Mele Mihemed Foto: Armanç

bikin yek û li hember politikaya ku dijmin li dijî Kurdan dimeşîne, rawestin.

Şevnem Resul Mamosta Zarokan jî bi dilşawati hisên xwe wisa anî ziman: Ez ji Sileymaniyê me. Helepçe nêzîkî me ye. Helepçe bi her awayî tim li ber çavê min e. Ji bo min xebereke herî nexweş tirîn bû. Ez nikarim tesîra jana Helepçe bi kelîman îzah bikim. Berî her tiştî ez Kurd im, loma jî normal e ku ev barbarî,

"Qetliama Iraqê ne ji niha da ye, ji zûdeye tê kirin. Qetliama niha malxirabî ye û êrîşek faşîstî ye. Pêwîste em li dijî wan bisekinin. Ez dixwazim, temamê însanên cîhanê li dijî vê qetliamê raweste û alîkariya Kurdan bike."

dixwazim, temamê însanên cîhanê li dijî vê qetliamê raweste û alîkariya Kurdan bike.

Gulfer Guçlu(Avuqat) : Ev, Hîroşîma duduyan e ku li Kurdistanê tê jiyandin. Hûn zanin rewşa Tirkîyê jî pîrrê hesas e. Em li xwe xwedî derkevîn. Tiştê ne baş ewe ku em li pey hêzên din in. Û ev netîca wê ye. Piştî 6 mehan Îran jî wê tiştêkî wisa bike, garantiya vêya yek




Leyla(bermalî) Foto: Armanç

nikare bide. Ji bo vê jî pewîst e em xwedî li xwe derkevîn, bi hemû quwetên xwe zora dijmin bisekinînin.

Cemal Reşîd (hunermend) baweriya xwe wiha anî ziman: Bi baweriya min ev tiştê ku li dijî Kurdîstana Iraqê çêbû ye, karekî rasistan e, karekî faşîstan e. Ev li dijî mirovatiyê çêbû ye. Lazime hemû dinya li dijî vê ya bisekin e. Li

HEVPEYIVÎN HEVPEY



Pîra Emîne Foto: Armanc

Ewrûpayê wexta segek (kûçîkek), çêlekek tê kuştin hemû Ewrûpa, Amerîka û Organîzasyonên mirovatiyê dengê xwe bilind dîkin. Lê belê bi hezaran Kurd bi çekên kîmyayî hatine kuştin, hemû cîhan bédeng e. Ev şerma cîhanê ye, ev şerm e ji bo Koma Miletan, şerm e ji bi hemû hukmetên Ewrûpayê û hukmetên şaristanî û organizasyonên mafê mirovatiyê.

Gulîstanê(dengbêja Kurd) jî fikrên berê ducar dikir: Îro ku ev qatliama ku li Kurdistanê tê kirin Hitler li dijî Yahûdiya û Amerîka li dijî Vîetnamiya pêk anî. Lê belê mixabin di wê demê de dinya li pişt Vîetnamê û li pišta Yahûdiyan derket. Lê em îro nikarin bêjin ku cîhan li pişt Kurda derdikeve.

Jinek Biyanî ku di nav meşvanan de bû hisên xwe wiha diyar dikir: Bûyerek wisa nehatiye dîtîn. Tiştê bê şansîye ku peymanên aşîtiyê û li dijî çekan tê îmzekirin, ew tişt çêdibe. Pêwîst e Kurd ne tenê li dijî çekê kîmyayî bisekine, ji ber ku Kurd karin bi çekên konsensiyonel jî bîn kuştin.

Hulya (Bermali): Bajarê Helepç, ku li perçê me yê Kurdistana Iraqê hatiye îmhakirin wek tekerura Hiroşimayek duduyan e. Berê dinya li qetliamên ku li dijî Kurdan hatibûn çekirin bê deng mabû. Em hevidarin ku li dijî wê qatliamê cîhan wê bê deng nemîne.

Meriv van dîtîn û bavariyên jorîn ne mumkune ku qebûl neke. Pêwîst e Koma Miletan û Organîzasyonên pêşverû, hukûmetên demokrat û welatên Sosyalîst piştgiriya gelê Kurd bikin ev gelê ku, bi sed salane li ser axa xwe li dijî kedxuriyê û çavsoyîyê liberxwe dide.

Pêwîst e ew guhê xwe bidin hawar û gaziya zarok, jin, mêr û kalên Kurdan. Ma wê heta kinga cîhan bê deng bimîne?



Rojnamevanê Swêdî Stefan Hjertên Ji Helepçê Vegeriya:

"Wahşetek bû, min di jiyana xwe de tiştêkî wiha nedîtibû"

Piştî ku rojnamevanê Swêdî S. Hjertên ji Helepça wêrankirî vegeriya, Armancê pê re hevpeyvînek kir. Tiştê ku li Helepçê dîtibû bi peyvekê anî ziman: wahşet!. Li jêr em vê hevpeyvînê pêşkêşî xwendevanên Armancê dîkin.

Pirs: Tu kingê û bi çi awayî çûyî Helepçê?

Bersiv: Jenosîd di 16'ê Adarê de roja Pênçşemiyê hat kirin. Her wê rojê jî konsolosên Îranê yê li hemû welatên der, telefonî rojnamevan û ajansan kirin. Di derheqê jenosîda Helepçê de agahdarî wan û ew dawetî Helepçê kirin. Berê telefona servîsa-TV jî daweta Îranê re got na. Di vê navê re, telefonî me jî kirin. Lê divê neyê ji bîr kirin ku Îran vî karê han ji bo propoganda xwe dike. Çûyina Îranê bi teyarê zehmet bû. Ji ber ku Iraqê misîl diavêst ser Îranê û nedibû ku em bi teyara Îranê bifirin. Ji ber vê yekê jî em bi Aeroflot firiyan çûn Îranê, li wê derê heftêkê man. Bi helikopterê jî em çûn Helepçê.

Pirs: Dema tu çûyî Helepçê û te termên (laşên) insanên li kuçan dît, te çi hîs kir?

Bersiv: Wahşetek bû, min di jiyana xwe de tiştêkî wiha nedîtibû. Lê li vir tiştê herî girîng ku divê xelk pê bizanibe ev e; ev kirinên ha wê li ser Iraqê pîr biha rûnê. Hemû dinya wê wê jenosîdê protestobike û wê Iraqê bê mahkûmkirin. Û divê ev protesto û mahkûmkirin bidome ku Iraq careke din bombeyên kîmyayî bikar neyne. Em pê dizanin ku Iraqê berê jî di gundan de, di çerçeweke biçûk de bombeyên kîmyayî bi kar dianî, lê nedihate bîra kesî ku Iraq bikaranîna bombeyên kîmyayî bi vî awayî fireh bike.

Îro bûyera li Helepçê jî alî hemû dinê hate dîtîn. Divê mirov wê kirinê rûreş bike.

Pirs: Iraqê berê jî bombeyên kîmyayî bi kar dianî, lê masmediya di derheqê wê de pîr tişt nedinivisand.

Bersiv: Belê, lê tu şahid ji kirinên Iraqê re tuncbû. Lê îro hemû dinyayê bi çavê xwe dît. Berê Iraqê ciyê ku bombeyên kîmyayî bikardianî ji rojnamevanan re qedexa dikir, nedihîşt rojnamevan bikevin van ciyan. Lê Helepçê jî alî hemû dinê ve hate dîtîn. Iraq nikare veyan înkare bike.

Pirs: Gelo te li Îranê Kurdên birîndar dîtîn?

Bersiv: Belê nexweşxane li derê Teheranê hene û li van nexweşxanan nêzî 4-5 hezar Kurdên birîndar hene. Kurdên ku birîndar nebûne di Stadyûmekê de bi cî kirine. Stadyûm bûye kamp ji bo Helepçeyîyan. Bi rastî dîtina van kesan ez pîr eşandim. Dîtina yê mirî ez zehfîr eşandim. Ne tiştêkî insanî bû. İnsan di ciyê xwe de miribûn. Gaza siyanîd însana di derbekê de dîkuje. Kesên ku gaza senap li wan ketiye, şewitîne. Şewata gazê êşek pîr dijwar dide. Yê mirî jî wê êşê xilas bûne, lê yê birîndar di rewşeke pîr ne xweş de ne.

Min Kurdên birîndar ziyaret kirin. Lê pîr mixabin bi wan re axaftin ne mumkûn bû. Ji ber ku ez Kurdî nizanîm. Bi rastî dîtina wan ez pîr eşandim.

Pirs: Gelo danûstendina te bi Kurdên Îranê û yê li Iraqê re hene yan na?

Bersiv: Belê heye. Ez çend Kurdan ji Îranê, dinasim û danûstandina min bi Kurdên li Swêdê re jî heye. Min li Îranê nîminendê Yekîtiyê Nîştîmanî Kurdistan dît û ez bi wî re jî peyivîm. Him ji Barzaniyan û him jî ji Talabaniyan pîr Kurd li Îranê hene.




Foto: Armanc Rojnamevanê Swêdî Stefan Hjertên

Pirs: Kurdên liwelêt li ser bûyera Helepçê çi dibêjin?

Bersiv: Mesele ne tenê mesela Kurda ye. Hemû kesên li Îranê di nav tîrsekê de ne û tîrsa wan ew e ku Iraq bombeyên kîmyayî bavêje Îranê jî. Ji ber vê yekê jî Îran dixwaze muxalefetek fireh li dijî Iraqê pêk bîne. Tîrsa wan ew e ku misîlên dikevin Teheranê misîlên gazê bin. Ji ber vê yekê jî Îran dixwaze Iraqê rawestîne.

Pirs: Dema tu li Helepçê bû, ew tiştê ku herî pirtirîn tesîr li te kir çi bû?

Bersiv: Bûyerê bi xwe, tesîrek kûr li ser min hiştiye. Lê tiştê ku hatiye serê gundê Enapê tesîrek kûrtir li ser min hişt. Enapî bi alîkariya xwe ya bi pêşmergan re bi nav û deng e. Enapiyan berî bombebarandinê alîkariya pêşmergan kirine, ji bo alîkariyê kesan gundê xwe terk kirine û dane rê û di wê demê de bombeyên Iraqê bi ser Enapê de bariyane. Bi sedan insan li der û dora gund dirêjkirî, yan jî rûniştî mane û mirine. Zarokên biçûk, jin û pîr hatibûn kuştin.

Pirs: Berî wê çûyî jî qet tu çûbû Kurdistanê?

Bersiv: Belê, li perçê Turkiyê min Hekarî, Diyarbekir û Yuksekova dîtibû. Ji perçê Îranê par, çaxa Îran Hecûmran bidest xistibû, ez çûbûm. Min wê carê Rewanduz jî dît. Carekê jî dema ez çûm Lubnanê, min Kurdên wir dît.



Kolanek ji kolanê bajarê kuştî Helepçê

Foto: Stefan Hjertên

ÇÎROK

BERTÎL

-2-

Hîn sibe baş zelal nebûbû çû li ber deriyê doktorekî dirana sekînî.

Got:

- Bikşîne, diranê min gişan bikşîne!

-Min fahm nekir?.. Vêsê (vê sibê) qey tu neçê ji xew rabûyî axa?.. Ma diranên saxlem tên kişandin gidi? Ev diran giş sip û saxlem in.

-Tu çi mirovekî ji gotinê fahm nakî yaho!.. Min ji te re got bikşîne. Qey te ez nas nekirim?

-Nenaskirina te ne mumkûne axa... Hemû mintiqe baş te nas dike.

-Wê çaxê, dibêjim bikşîne. Hemû diranên mina bikşîne (hilkişîne) dibêjim ji te re!..

-Min efû bike axa. Tobe, welle nikarim bikim. Diranê saxlem ezê çawa bikşînim. Ma qey tu dikî min ji diploma min bikî axa? Tobe. Tobe wellehî. Qey vê serê sibê nêta te tercubekirina min e axa? Himm?...

-La hewle wela quwwete illa billa...

Ji ber ku baş aqilê wî birrî ku mêrik dibêje Nûh nabêje Pêxember, bê çare, wek ku hatibû her wisa bi hêrs derketibû çûbû. Wê rojê li tixtorên dirana yek bi yek geriya. Lê kesî nedixwest bikşîne, her yekî behanak didit. Di dawiyê de bi zar û zor karibû yekî razî bike.

-Law (kuro) çi ji kê ree? Kî dikare qarişî (têkilî) min bibe ha? Ma diran ne yê min e? Dev ne yê min e?

-Heyf e axa, Wellehî heyf e... Diranên sip û saxlem in...

-Law bikşîne!.. Ji te re çii?

-Tu yê nikaribî deyax (damîş) bikî axa, Wellehî tu yê nikaribî tehamulî êşa hewqas diran bikî...

-Law gewaaat... Ma qey tu texmîn dike ku li ruyê dinyayê ji êşa hundurê min hîn mezintir êşek din hebe?.. Bikşîne ez ji te re dibêjim!..

Bi rastî jî bêtî ku bibêje kirt, hemû diranên xwe kişandibû. Ji ber vê yekê, piştî ku دنیا baş tarî bû vegeriya gund. Erê gepên wî, lêvên wî hîn bi ruh (ne qermiçî) bûn, bi carê de neketibûn hundur hev, lê cardin jî di rewşek wisa de bû ku zor dihat naskirin. Çaxa (wexta) pîreka wî jî dit, berê nas nekir, şaş bû.

Bi dehşet got:

-Ev çi hale ez bi dorê?

Li ber geriya li ser geriya, lê yek gotin be jî nikaribû ji dev bigirta.

Cardin ket oda xwe. Tu kes berra cem (ba) xwe neda. Di halekî wisa de nedixwest kes wî bibîne. Birinên devê wî ji bo ku gawekê berî gawekê sax bibin, bi sebir mijûl dibû. Nabên nedixist navbera dermanên xwe. Hebên xwe dixwar, di wextê de xerxera (xelxela) xwe çedikir. Dewamî jî şîrê germî nuhdotî vedixwar.

Kewandina birinên devê wî hew (ancax) çend roj ajot. Çaxa wî bi xwe jî êdî qerar da ku birinên wî kewiyane (rehet bûne), goştê diranên wî baş bûye, evarî deng li pîreka xwe kir, şiv xwest. Lê, mumkûn niye...Hîn di pariyê pêşî de eynî wek berê, cardin madê wî li hev ket, dilê wî rabû, دنیا ziz bû. Pariyê devê wî mezin dibû û mezin dibû. Bi zor gihîşt pacê. Bi ulqîn dirêj dirêj vereşiya. Ji devê wî ava zer û kesk hat. Mumkûn niye. Dilê wî nedigirt. Peyê(zilamê) mest û mezin, roj bi roj diheliya û diçû. Pîreka wî ma neçû ba xocan, ma nivîşt (nuxse) çenekir, ma qewl (ahd) nekir, ma dizî bi dizî qurban şerjê nekir... Lê, fêde nekir...Peyê wê kes qebûl nedikir. Bi texmîn roja dehan a derî

li ser xwe girtina wî felan bû. Çaxa xeber hat ku lawê wan ji alî Qumandariya Urî İdara Anqerê ve hatiye girtin, pîreka wî hewqasî şa bû, hewqasî kêf kir ku. Difikirî ku wê ji vê xeberê re deyax(tehemul) neke, wê muheqeq ji oda xwe derkeve, pê re bipeyive. Bi kêf bazda jor; got:

-Lo axa! Lawê me girtine. Li Anqerê. Qumandariya Urî İdara Anqerê lawê me girtiye... Egidê me ji xistine hefsê lo ez bi qurban bûmo...

Feqet wek dipa nebû. Bes; bi hêrsek ji dil pirsî, got:

Kê daye girtin.
-Anqerê ez bi qurban...Qumandariya Urî İdara Anqerê...

Carek din bersiv ji neda.

Bi wext e vana giş qebûl kirin, ji neçarî. Derî û pace ji cihana der re girtin, kişyan qalikên xwe. Roj bi roj nigên ciran û nasan, dost û merivan jî hat birrîn. Her tişt ji xweber tabî bûbû êdî. Cardin heftak deh roj di dûre bû bi texmînî. Jinika reben, niznibû ku çer bike bi nezani, eniya xwe girê da bû, li ser sujdakê (sec-cadekê) rûniştibû, geh bi pista pista duan, geh barandina lanet lanetan, li heywana binî wê gava ku ji xwe re dikir û dilûband (ji xwe re bi halê xwe de digot), deriyê kuçê sert sert lê ket. Li wan ortan kes tunebû. Ban kir, bi kesî neda bihistin. Derî jî ji berêvê de bi hêrs hêrs lédiket û lédiket. Ji neçarî, rabû bi pile pil çû derî vekir. Vekir ku di derî de sê leşkerên tu dibê qirrase. Cendirme. Xêre inşallah...

icar jî li mal li lawê wê digeriyan. Xwestin ku wê dahf din û têkevin hundir. Singa xwe da ber, li hember wan sekînî.- Got di erdê ketino. Wek ku meriv bigre ser şikefta eşqiya, li ku derê hatiye ditin ku mala axê çavî bi çavî hatiye saxikirin? Destûr!.. Lawê min li vir tune. Kî li lawê min digere?

-Qumandariya İdara Urî ya Diyarbekir, dayêê!..gotin leşkeran bi tirs.

-Lawê min li Anqerê ye. Li Urî İdara ya Anqerê girtiye. Heger qumandarê Diyarbekrê pîr meraq dike, bira navnişana kurê min ji İdara Urî ya Anqerê bipirs!

-Yanî lawê te nuha li Anqerê girtiye dayê?

-Erê leee!.. Li Anqerê girtiye.

Kaxet derxistin, nivisandin, çixiz kirin, dû re jî lê xistin çûn.

Te dit, xwe dabû hember leşkeran, wexta qala lawê xwe dikir jî bê taqetiyek wisa mezin di dilê xwe de his kiribû...

Piştî ku leşkeran lëxistin û çûn, giran giran derket jor. Li ber deriyê peyê xwe xwe bera jêr da.

-Bi halkî westiyayî bi dengêkî bê mecal got.

Hey miroo. nuha ji ji İdara Urî ya Diyarbekrê li lawê me digerin..

Ma xwe ne peyê wê, wê yên hatî meraq bikira û li paboka wê bimana. Hîn axaftina wê qediyabû neqediyabû, derî vebû. bi derbekê ve wek xofekê li serê wê sekînî. te digot qey hemû valaya derî girtiye.

Bi xişim got

-Te got çî? te got çî? A nuha ji ji İdara Urî ya Diyarbekrê li liwîk (lawik) digerin?

Por tevhev bûbû. Hestî û çerm mabû belkî. lê dengê wî bi zinge zing zingîni ji her derê danî.

-Erê le, nuha ji ji Diyarbekrê lê digerin ez bi qurban...

Demirtaş Ceyhun

Wergêr: Z. Xamo

-Te ji wan re got çî?

-Min got li Anqerê girtiye, ez bi qurban. Min got heger hûn pîr meraq dikin, navnişana lawikê min ji İdara Urî ya Anqerê bipirsîn.

-Çii? Min fahm nekir!.. Yanî te navnişana lawê me da cendirman, dina heram? keçê jina bê hişşş, yanî te ji cendirman re got ku lawê me li ku ye? wey wey wey...wey xêvê wey!.. Bazde!.. haydê rabe ji ciyê xwe... Keçê navnişana liwîk ma qet ji cendirman re tê gotin? haydê rabe!.. Berî İdara Urî ya Diyarbekrê divê em bigihjin lawê xwe ! Haydê, bilezîne, hespa min bide zinkirin!.. Merivan zû bişîne, bira ji min re balafireke (tiyare) Anqerê bigrin. fahm bû? Haydê, zû ke!..

Tavilê hesp zîn bûn, peya hatin derxistin. bi rastî jî, di navbera hatina cendirman a malê û gihastina axê ya Anqerê rojek jî derbas nebû. Dotira sibê li Anqerê bû. Ji hemû dostan re, xisim û merivan re, hemşeriyên re, ji kesên xwedî xatir re xeber hat şandin. Ji wan re got, "Ez dixwazim lawê xwe bibînim" "Him dixwazim ciyên ku lawê min lê radikeve bibînim, him ji dixwazim lawê xwe ziyaret bikim. Lê bes em her du, bi tenq serê xwe, dixwazim di odakê de em hev du bibînin. Hat fahmkirin?"

Rê û dirbê ditin. Bêlki ew imkanên gerra qawuşên ku lawê wî tê de radiket nehatibû teminkirin, bes ji dîr ve wan derana rê dabûn, lê bi rastî jî wî û lawê xwe di rewira Hefsa İdara Urî de bi tena serê xwe hevdu ditin, peyivîn.

Lawê wî jî, ew zor nas kiribû. Di nav dehşetê de mabû.

-Ev çi hal e, tu bi qedrê xwedê dikî bavo?..Çi bi te kirine. Tu bûyî wek ta û derziyê lo!.. Çi bi diranên te hat wisa? Hela bibêje...

Bi hêrs got

Hela dev ji min berde. Nigekî min di kortê de tê hesêbêdî. Hela tu bêje !.. Esas emê te çawa xelas bikin?-

-Min fahm nekir. Te min çawa xelas bikî? Ji bo çî?

-Hela ka bibêje, dawê çawa bû. Ma mahkemeyên te filan qediyên? Ma tu mahkûm bûyî?

-Naaa...Hîn mahkeme dom dikin.

-Ê wê çaxê qurban, nuha baş li min guhdarî bike. Çawa be li vir jî yên bi itibar hene. Temam? Nuha tavilê emê wan bibînin. Wê rê nişanî me bidin. Di mahkema te de kesên xwedî xatir kî ne? Di nav wan kesên bi xatir de, emê herin serî li kê xî? Yanî, nuha abûqatê te ya ji dostên te wê nav û navnişana wan kesana filan bide me. Emê herin ba wan kesên xwedî xatir. Hema çi bixwazim emê bidin. tamam? Sê milyon, pênc

Sermiyanê gel

Elîkan Berçem

Nafikbirîna cotek kategoriyê felsefê di gotinê pêşiyê Kurda de:

Perçe û Gişahî

Perçe û gişahî kategoriyê felsefê yê girîng in. Ew çiqas li hember hev bin jî, hewqas jî bi hev ve girêdayî ne. Mirov bi saya katogoriyên felsefê perçe tişt a jî hev û din kifş û ferq dike. Ew newekheviya tişt a jî ser -xwebûna wan a relatîv tîne ser ziman. Em van hûyê (adyektîfê) kotogoriyê perçe di vê gotina bav û kala de dibînin. "Kes nakeve gora kesî" an jî "mî bi lingê xwe, bizin bi qiloçê xwe, her kes bi kul û karê xwe."

Di van herdu gotinên pêşiya de bi şiklekî pîr rêhet, heya ciyekî mirov kare bêje bi mantiqekî prîmîtîv, kategoriyên felsefê yên perçe hatiye bikaranîn. Di vir de a muhîm ne qiloçê bizinê û ne lingê mî ye, ne jî gora kesî û ne jî kul û karê kesî ye. Ya da vir de hewce ye, ku mirov bala xwe bidê û tiliya xwe deyne ser, ev e: Şanîdana firqekirin û kişkirina tiştan, newekhevî û serxwebûna wan a relatîv jî hev û din. Heke mirov bi zanîn anjî bi nezani bike, gava mirov tişt a jî hev û din diqetîne, hingê mirov xwe dispêre kategoriyên felsefê perçe.

"Yek yek e, dudu kulfetek e." "Di vê pêşgotina Kurda de ji terefekî din ve li kategoriyê perçe û gişahî hatiye mêzekerin. Mirov di vê pêşgotinê de hûyê van kategoriyên yên din dibîne. Qey dibê ev pêşgotin jî qestî û bi zanîn hatiye gotin, qene ku ew vanê me li jor bahsa wan kir tamam bikin.

Gişahî jî yekîtiya perçe a diyalektîk pêk tî. Ev nayê vê manê, ku hûyê gişahî tevahiya berhevkirina hûyê perça hemiya yê artîmatîk e. Hûyê gişahî jî hûyê perçên yên ku wî diafirînin firqetir e, ji ber ku yekîtiyê û girêdana perça a diyalektîk bi hev re tiştêkî nûh tîne meydanê. Û ev tiştê nûh xwedî hûyê xwe yê arîzî û serbixwe ye, heke çiqas ev yek relatîf be jî. Dê qey dibê lewma pêşiya gofiye: "Yek yek e, dudu kulfetek e." Bi saya şixwilandina kategoriyê gişahî mirov hûyê tişt a yê muşterek tespît dike.

Lê belê her çiqas hûyê gişahiyekê jî hûyê perçê ku wî diafirînin firqetir be jî, dişa jî ev firqiyet ne absolut e. Ji ber ku yekîtiya di nava perça de ye, ya ku gişahiyekê çêdikin, girêdaneke diyalektîk e. Hînbûn û naskirina hemî gişahiyê û tersê vê yekê jî rast e. "Şahdê rovî duvê rovî ye."

milyon, deh milyon, êdî çî be... Bes daxwazek me ji wan heye; wê te li vir mahkûm bikin. Pênc salan, deh salan, êdî her çî be, wê te muhaqeq li vir bidim mahkûmkirin.

-Min fahm nekir? Ew ji bo çî ye, ew? Çima?

-Çima mema wê heye lawo?..Nuha jî ji Qumandariya İdara Urî ya Diyarbekrê li te digerin, haya te jê heye?

-Ji Qumandariya İdara Urî ya Diyarbekrê li min digerin? Bira bigerin... Wê çî jê derkeve?

-Hih, hih?

Bi carê de bi helke helk ji pozê xwe bin girt û berda, bîstekê wisa tik tik li nav çavê lawê xwe neri û ma. Çawa dibû ku lawê wî tiştê ku wî dixwest bibêje fahm nake? cardin jî kûr bînek girt. Dû re bi hêrs got.

Ez ji te re dibêjim Diyarbekir!.. dilê wî teng bûbû. Dirêj dirêj kuxuya, kuxukek lê selitî (kuxukê ew girt).


Lawê wî hîn mit û mat mayî, li çawê wî dinerî.

-Ez ji te re dibêjim Diyarbekir...

Lê zêde debar nekir, bi carê de xwe li lawê xwe piçikand û vala bû. Dest pê kir kûr kûr giriya. Çaxa digiriya jî di nav hîskîniyan de digot bi nuhurandin:

-Gûbi min dan xwarin lawê min. Gûbi min dan xwarin.. Guyê min bi min dan xwarin.

Hişk hişk li lawê xwe piçikandî. bi hiske hisk, dirêj dirêj giriya.



"Beyta Biharê"

MENSÛRÊ GIRGAŞÎ

Subhan ji Şahî bê çun çe biharek keskûn e
Qadir "kun fe yekûn" ji erdan derbûn 'iyûne
Kuhsarê di mehzûn bi îzana wî vebûne

Kuhsara vederkeftin hilalan ser hilîne
Di nêv kevran verestin beyan bû erdê şîne
Tevrî ji bin derkevtin kêrî bibûn rengîne

Munneqêş bû cîbale ji palal û beybûnan
Ji dengê re'dê biharî wî hilat kêrestûne
Wî nazil bûyî xelate beyaban tezyîn bûne

Tezyîn bûn koh û sehra bi lutfâ zulcelalî
Ehmer bûn deşt û çiya bi kulîlkên biharî
Yeqîn xelatî île ji bû dinyayê hinarî

Xel'etî sor û zer bûn hinarî ji bo gelûke
Kuhsara munewwer bûn murxan li ser çîk çîke
Li mêrxuzarê derengîn 'endelî like like

Sipehîbibûn mêrxuzar bi kevî yû kaniyêt
biharê

Muneqêş bûn cwîbar têtin dengê 'endelî
Bi sosin û binevşan bi nêrgizêt xumarî

Temam kemilîn dunya bi zîyneta biharê
Kebkê(1) d'miwetînciya wêt ji wir da hatin

Dê xebierdin ji hemiyân hind bû medhê Adarê
xwarê

Nîsan bi lutafet e bi kevî yû kaniyan
Kêrî bûne cinnete bi qudreta rebbaniye
Çi xelkî bê îbret e dana be nêv şahiyân

Şahî û sefa û sirûr ew sabin d'biharê
Çiya geriyan di me'mûr di neşîet cwîbarê
Zahir bû cumle mestûr d'meha paşî Adarê

Cobar û bax û bîstan kamil bûbûn tevave
Şehlûl û 'endelî bûn meşyane hatin nave
Cewab bibine reqîban wa'l nêrgiza xunav e

Nêrgiza bişkoj daye sosin hem xurûş e
Lale pur cefa ye sunbul bi qeba poş e
Biharekî e'ela ye sosin zêrîn girş e

Sosin di nav baxan zanzur digrin xunavê
Nêrgizê ser çiqande qedeh pur bû ji avê
Sîmen wereq nîşan daeksî li neqşê avê

Neqşî kirin cwîbar bila çû werda exder

Sinober û gulbihar kulîlkêt mu'enber
Gulşilêl û lalezar Nîsanokên di ehmer

Ehmerî sorî tarî daxa li ruyê lale
Zerveşan bû xumarî şebnem lê buye jale
'Erq(3) çîn bûn biharî bi qurmiz şîn û ale

Qurmiz û şîn û sefid mulebbes bûn kuhsar
Keskî seraser di mîd tîbe bûn cwîbar
Fedleke pake se'îd mufferreh bûn mêrxuzar

Mureffeh bûne zînî turazînî dibin xoş
Pak xemilîn bi şînî kesk û zer û al û reş
Pîvazî yû yasemîn gîrîk gêran muneqqeş

Neqqaşî gêra qelem resand şebirza şîne
Gerdena wekû 'elem ji bin befrê hilîne
Beybûn bibûn der qedem lazimêt êk dimîne

Beybûnokêt nihala jê têt bêna mu'enber
Gerden ji reng piyalan dirrêjin miskê ezfer
Nezer da ev cîbalan mukemmel bûn sor û zer

Sor û zerê semawî çiya kirin 'eyane
Bi narincî yû mawî kulîlk kirin beyane
Du meh d'çûne musawî xelas bibû Nîsane

Di vê meha Nîsanê bûne selatîn cebel
Dihat meha gulanê roj hate j'burca h'emel
Xoş bû weqtê seyranê dunya bûbû mukemmel

Dunya bûbû bişrûne turazan bû dilara
Bi emrê "kaf" û "nûn" e werandin 'enber sara
Bi 'etrî Şah bûne çîmen li wan nizara

Nizar ku bûne xara beroj ku bûne etles
Dişandin 'enber sara ji zêr camî museddes
Di mexrib û sehara veezman hate exres

Exres ku 'endelî bûn kebki di kuhsaran
Di subha ewwelî bûn êvaran car û baran
Şehlûl û 'endelîb û bilakutka(3) beyaran

Bilakutk û 'endelî pur ji neqşê selîm in
Dixûnin subha ewwelî di zikrê Şahê 'elîm in
Şebî gulî bilbilî e aşiqê nesîm in

Nesîm bi weqtê seher dixşêt li teyibatân
Sik li dîmaxê esfer êk e ji mu'cîzatan(4)
Bi keskîv nivîsî mexder tuxra sirrî beratân

Mensûrê Girgaşî

Ebdulreqîb Yûsuf

Mensûr şairekî kevn e Kurd e. Xelkê gundê
Girgaşê ye. Girgaş, gundekî biçûk e navça
Behdînan (Kurdîstana Iraqê n.m.) e û dikeve
rojhilatê bajarê Amêdiyê. Di bin rêze-çiyayekî ji
Çiyayê Garê de ye. Navbera herdukan nêzikî sê
saet rê ye.

Mamoste Elaeddîn Secadî, di Mêjûyî Edebi
Kurd, rûpelê 536'an de bi kurtî behsa navê
Mensûr kiriye. Dibêje "Mensûr xelkê Botan e û
hevçaxê Melayê Bateyî ye."

Min nameyek ji Seyda Şex Memduhê Birîfkani
re şand û hinek pirsîyar jê kirin, ji ber ku
şarezayîya wî li ser şair û helbestên Kurdî heye. Di
nama xwe ya ji min re şandî de dibêje: "Mensûr
xelkê Girgaşê bûye û hevçaxê Melayê Bateyî ye. Di
navbera herdukan de helbestek hatî
gotin(munazere) heye."

Em ji derveyî vê tiştekî din li ser jiyana wî şairî
nizanin Em nizanin di kîjan salê de ji diya xwe
bûye, kengî miriye û jiyana wî çawan bûye. Em eva
han tenê dizanin ku 209 sal berî niha bûye. Ji ber
ku helbesta wî ya "Subhan ji Şah e bê çun" di nav
wê keşkula destnivîs de heye.

Ev helbesta han li ser biharê hatiye, gelek xweş
û rewan e. Gotinên Kurdîyên gelek giranbiha tê de
ne û heta niha kêr helbestên wiha xweş li ser
biharê hatine nivîsin.

Ev helbesta han di navça Behdînan de bi navê
Beyta Biharê bi nav û deng e û gelek kes dibêjin ku
ev helbesta han a Bekir Begê Erzî ye. Lê eva han
ne rast e. Ji ber ku navê Mensûr di rêza dawiyê de
heye û her wiha de navê wî wê destnivîsê de bi navê
Mensûr hatiye nivîsin. Wextê di nav wê helbestê de
navê wî hatiye nivîsin (1181'ê hicrî) temenê (umrê)
Bekir Beg du sal bûye. Bekir Beg di sala 1179'ê
hicrî de ji diya xwe bûye.

Lê helbesteke Bekir Beg jî li ser biharê heye.
Gelek nêzikî wê helbesta Mensûr e: Ger mirov
herdukan bixwîne, mirov dikare bibîne ku Bekir
Beg wê helbesta xwe li ber a Mensûr nivîsiye, lê
negihîştîye sewiya wî, her çiqas şairekî mezin ji
bûye. Helbesta wî Medîna xweştirin helbest e.

Tuxra ku zer nîşan kir dav bilbilê malxirab
Seba 'enber veşan kir mînayî reng da ciwab
Gulê xunçe 'eyan kir bi hal xef da ciwab

Ez sorgula bi naz im me mesken sehan bax e
Sed car ku ez mecaz im dilê te vetnîm dax e
Keşfa cemî' razim meftûh her dîmax e

Dîmax sote bilbil ji bihna min dinalin
Çîçek û terh û sinbil hindî zeher li bal in
Av û hewa di daxil di bezma lîsanê hal in

B'lîsan halî tiyûrin seyran giha nexmesaz
Lale kevî di hûr in zînet li baxê mecaz
'Enber û 'ud û kafûr tawûs û zax û şehbaz

Şehbazî emrê ehed felek kirin ney ligun
Daniya ferşê zumred reqem kirin "kaf" û "nûn"
Nuqetê ma li eded bi nexme ma yeştehûn

Bi nexmeê tesbîhan veezman tîn tiyûre
Ji exres û fesîhan pakî dibit zihûre
Ji Mûsî yû Mesîhe da'î bi xo Mensûr e

(Ji Dîwana Kurmancî)

(1)kebk: kew

(2)Baş nehat xwendin, ne dîr e kelîmeyer din be.

(3)bilakutik teyrek e

(4)Peyva "sik" her wiha hatibû nivîsin, dibe ku xelet be.

Helbestên Xwendevanan

ZÎNDAN

Li zîndan im îro
Bê kes im ez
Lê tenê nînim
Hevrikyek min heye
Navê wê bawerî ye

Li zîndan im îro
Bê zarû û jin
Bê dost im
Lê ne bê evîn im

Kaniya Reza

Evînek min heye
Navê wê têkoşin e

Li zîndan im îro
Bê kinc û pertal
Bê pêlav û şikal
Lê ne tazî me
Kincek min heye
Navê wê jîn e

Destê jû Kurdî çirê şikiya?

Laser Sêwrekij

Qandê ki sūkda xo di karê nêvînabi, zey se hezaran a Kurdî şî sūkênda Tirkîye. Nameyê sūki Tekîrdax(Tekîrdag) bî. A sūk di çend nasê(şinasîyê) ci jî estîbî. Wica di xo rê geyra kar. Verî inşaatan di gurweyabi. Tayn dawitene ra fam kerdê. Şî çend inşaatan ra pers kerd. Dima jû taşaronî kar da ci feqetkar di nehîyeyêndê Tekîrdax'î di bi. Şewra şî cadê karî, demeyê gurweya.

Her roj bahdê karî şîyê qahwe û televîzyon ra winîyayê. Kesî ya vê-şî alaqeder nêbîyê. Tenya jû-didi merdimî ya finfin tewla kay kerdê.

Rojê dawitena xercî rew qediyay. Qandê ki şanî rê tayn mendibi, newede ra xerc nêviraşt. Dest û rîyê xo şût, çinayê xo vîra û zeydê her rojî şî qahwe. Hima(deha) televîzyon nîyabibi. Xarsonî çay vila kerdê. Çayê jî ey ver di ronay. Çayda xo ra qultê şimîti.. A roj bol 'edizyabi. Çaya xo ki qedînay cixa-reyê

xo vist ci. A game welat ame ci vîrî.

Tayn wext ravêrd, televîzyon abî. Tew ey ferq nêkerd televîyon abîyayo jî. Finê di bi çisandê "Kurdo pîs, wexto ki Istiklal Marşî ame wendiş çirê ti nêweriştê pay?.." xo hesiya. Panc-şeş kesî amey ci hetek û xeberî day. Belengazê ma va "haya mi çinêbî" jî xo nêreyna. Nê panc-şeş kesê ki bi hêrs a kef kewtibi ci fek, nêvinderdê û day Kurdê ma ro. Heta ki taynî kewtê mabeyn û pi ra abirnay, destêndê Kurdê ma şikiyabi. Dima nê panc-şeş kesî şî qereqol û va:

-No Kurd komunîst o, wextê wanîyayîşdê Istiklal Marşî di nêwerişt pay.

Kurdê ma berd qereqol. Qereqol di waşt ki fina piro dê, Kurdî va "destê mi şikiyayo". Weynay (winîyay) ki raştay a destê ci şikiyayo, berd xestexane. Destê ci kerd alçî. Bahdê na mesela Kurdê ma mitêlê xo guretî û şî welat.

Na mesela di ê ki destê Kurdê ma şikit bixo jî merdimê feqîrî yê. Çi fayde ki reaksiyonê inan reaksiyonê dijminî(dîşmenî) yo, reaksiyonê kolonyalîstan o. No jî ray dano-(nawnen) ki polîtîkayê şovenîstî eke(ki) bi polîtîkaya enternasyonalîzmî ya nîrê pûçkerdiş, karker û paley û dewijî jî pê rê benê dijmin. Bêguman qandê ki tesîrê şovenîzmîyo ki xelqê Tirkî sero esto biro şikitiş, wezîfeyo esasî çepê Tirkan rê kewno. Wezîfeyê ma welatperweranê Kurdan jî esto. Ganî(gerek) kesê şovenîstî û kesê ki binê tesîrdê şovenîzmî dir ê pê ra bîrê abirîyayîş. Panzehîrê tesîrdê şovenîzmê burjuvazîyê Tirkan, xurtkerdişê birayey û paştîgirewtîşê xelqanê Kurdistan'î û Tirkîye yo. Dijminê herdi(wirdîna) mîletan kam o? Gerek no dijmin weş bideyo zanayîş ki mesela jî raşt(rast) bêro famkerdiş.

□

Finik, mor, leyirê pisîngê

Arêkerdax: Usxan

Cencê esker ra terîs beno, kuno ra raye,yeno ke bêro welatê xo. Raye ra rastê dewê yeno. Zerê dewe ra vêreno ra, nîyadano ke domanû(qeçekan, gedan) leyirê morî(marî) pê gureto, pê kay kenê.

Heredîno domanû ra, leyirê mor domanû ra cêno, kuno ra raye yeno, rastê sūke yeno. Nîyadano ke çor kutikû gureto jû finik ra dorme de yenê-sonê rea ser nekûnê. Verdano kutikû keno tê ra, finik cêno, kuno ra raye sono. Zof ke sono, senik ke sono, rastê dewê yeno. Zerê dewe de nîyadano ke doman leyirê pisîngê pê gureto, pê kay kenê. Leyirê pisîngê kî domanû ra cêno, rawa xo ra yeno çê. Na hîre leyirû keno weyîye. Eke rind benê hewl, rozê mor vano:

- Az(ez) sonû çê.

Cenc vano:- Sona sū.

Mor cencî fino ra xo ver, beno welatê morû. Zerê sarayîye ra sonê, cenc nîyadano ke pasayê morû taxt de nişto ro. Mor vano:

- Nû piyê min o.

Piya sonê leyê pasay, mor pasay ra vano:

- Bawo, na cenc canê mi domanû ver xelesna. Na qul ke nêvîyênê belka az nika merdvî.

Pasa cenc rê duawû keno, jû kî îstane bêçika xo ra vezeno, dano cenc. Cenc cêreno ra yeno çê, çenekade rindeke wazeno, reseno murodê xo. Pisîngê ve kutikî ya kî ci rê xizmete kenê. Cenc jû şuwane ano çê, hem sono mal û gawû hem kî xizmeta

çeyî keno. Şuwane Arav (Arab) beno. Cîna na cenc asqê Arav bena. Dîjdî(dîzdî) ya yenê tê are. Pîya qesey kenê.

Rozê cenc û cîna xo rakûnê ra. Son de cenc nîstanê xo keno binê balisna xo ra. Sewe lete de cinike nîstane binê balisna ra cêna, eve şuwaney ra remenê. Soder cenc urzeno ra ke cinike çîna. Binê balisna de nîyadano ke nîstane kî çîno. Ci rê beno derd, beno nêwes, gînenê cilû ro. Yê kutik û pisînga kî şîya gînenê zere ro. Kutik vano:

- Wayê, se bikeme?

Pisîngê vana:- Bira, ma gereke nîstane bivînîme, canê wayirî bixelesnîme. Wayirî canê ma xelesna.

Kutik vano:- Wayê, ala bê gilê qawaxe ro bionciye, nîyade, ala cayê nêosenê?

Pisîngê vezîna(vejîna) ro gilê qawaxe. Nîyadana ke ha yê peyê hot kowû de hortê dengîj de sarayê viraşta, teder ê. Pisîngê yena war, kutik ra vana:

- Bira ha yê peyê hot kowû de, hortê dengîj de sarayê viraşta, teder ê.

Kutik ve pisîng a kunê ra raye sonê. Hot sewî û hot rozî sonê, roza(roja heştine sonê kinarê dengîjî. Pisîngê vana:

- Bira, çutîr some saraye?

Kutik vano:- Wayê be ero mi nise, az azna ken, some saraye.

Pisîngê nisena ro kutikî, kutik azna ken, sonê verê saraye. Dêse sarayîye tiro oncînê, sonê gilê sarayîye,

cor de lozine de lozine ro sonê war. Nîyadanê ke cinike ve şuwani ya teder linge esta linge ser, çêfê xo de nîyadanê. Pisîngê ve kutikî ya xo danê we, cinike ve şuwani ya kunê ra. Son de cinike sona tever(teber), pisîngê xeleşîna ra, nîstane binê balisna ra cêna, eve kutikî ra benê rast, yenê kinarê dengîjî. Kutik vano:

- Wayê nîstane bide mi.

Pisîngê vana:- Nê bira, tu hortê dengîj de mosû(masan) vînena, lawena(lowena), nîstane dana war o. Mi de vîndo.

Onca pisîngê nisena ro kutikî, kutik azna ken, sonê bover. Nîstane benê danê wayirî. Cenc nîstane cêno, beno wes. Cinike ve şuwaney ra soder urzenê ra ke nîstane binê balisna de çîno. Ax kenê, wax kenê, nîstane çîno. Cenc serê nîstanî çarneno cinike û şuwane peyser wazeno. Aye de cinike û şuwaney ra uza(uca) de vezîne. Şuwaney kiseno, cinike kî çê de heps keno. Çor ostorû hefteyê sole dano ci. Heftê ra tepîya ostorû ano, cinike ostorû ra girê dano, ostorû verdano ra, ostorû tîl benê, cinike kenê letey, parçey ay top nêbenê. Cenc reyna çenekade feqîre cêno, sono reseno muradê xo.

26-03-1987

□

Malmîsanîj

PEŞMIRIYAYÎŞ

Bi keyf û kay û şayî
peşmiriyayîş,
raşta yê weş o.
Weşê weşan, pîzze ra peşmiriyayîş
gama ki
ti bindê çiman ra ewnênî waşta ra
û çim şiknenê şima pê ra,
gama ki
vîynenî ti yew embazî pey beran di
cexra miyanê giştan di,
gama ki kuçan di
ti vîynenî qeçekan
ha tîq-tîqa înan,
nê zî ma vajîm
ti ewnênî yew rismê verînî ra
to vîr kewenê ay "verînî"
de bê bivinde, mepeshmiriyê!

Peşmiriyayîş: harmonîya mezgî
û zerri miyan di perpiziyayîş o
weş o peşmiriyayîş.
labelê
ado qestikêno qirriki ra cor
ne tê da!

PAWITIŞ

Mesajê partî pawitiş,
embaz pawitiş
-wa goşê yîni bireqê-
hela ayê ki erey kuwenê,
mektubê waşta pawitiş...
Derdê pawitişî nêancêno!

SERERÛT

Arêkerdax: Koyo Berz

Rojê merdimêdo sererût şîno ki berber porê ci kilm kero. Berber ci ra pers keno, vano:

- Porê to senî viraza?

- Porê mi kilm ki.

Berber porê ci keno "kilm", vano:

- Mi porê to kerd kilm, ez porê to hetê kamcî kişt a şane kera?

- Mûyanê seredê mi amori, bewnî çend mûyê mi sere di?

Berber mûyanê sererûtî amoreno, vano:

- Pêro panj mûyê mi to sere di.

- Hîrîni hetê kişta çep a şane ki, didini hetê kişta raşt a şane ki.

Berber şane keno, mûyê ci ra kewna, berber vano:

- Jûda ci kewti, newe ez senî şane kera?

- Didini kişta çep a, didini kişta raşt a şane ki.

Berber şane keno, fina jûda ci kewna, vano

- Jûna deha kewti, newe senî şane kera?

- Jûweri kişta çep a, jûweri kişta raşt a şane ki.

Berber şane keno, jûna kewna, vano:

- Jûna deha kewti, pêro jû tenya mendi, ez ay hetê kotî ya şane

kera?

- Hema ay jî hetê pey a şane ki wa şiro.

Berber şane keno, a jû mû jî kewna, vano:

- A jû mû jî kewti, newe ez se kera, senî bikera?

- Sereyê rûtî şane ki wa felhan bo, beno ki serna fina ruweno, kiho beno.

Ji xwendevanan

Karker û amadekarên ARMANC'ê;

Ev çend care ku min dixwest ji we re nameyekê rêkim. Rê neketê.

Bi Kurdî kovar derxistin hinekî mêraniyê dixwaze. Pirozayî ji bo mêraniya we!

Carna bi tesaduf ji be, mirov rastî hinek kelîmên Siwêdî tê di nivîsên ARMANC'ê de. Çi qedexetiya wê heye ku di şûna wan kelîmên Siwêdî de mirov kelîmên Tirkî an jî Erebi bixebitîne?

Bê guman heta kelîmek Kurdî hebe gerek merov tu kelîmên xerîb ne xebitîne. Lê wexta ew kelîma ku em dixwazin, bi Kurdî tunebe, ne pêwîste ku em di ser çend dewletan re baz bidin biçin ji dûrî xwe kelîmekê bistînin.

Ev rexnên min ji ber evîndariya min a zîmanê me ye. Ne ku dixwazim we aciz bikim.

Hêviya serfiraziyê dikim.

Kaniya Reza

Dûmahika xeberên rûpela 1'ê

Diktatoriya Xwînmij a Seddam bi çekên kîmyayî...

Diktatoriya Seddam di navbera 16 û 17'ê Adarê de, du rojan li ser hev li Helepçê û der û dora wê bi ser gelê Kurd de bombeyên kîmyewî barand. Li gor xeberên ku ji herêmê tên, di van êrişan de bi kêmasî 5 000 kes şehîd bûn û li dora 15 000 kesî jî birîndar in. Û ew bajarê ku berî vê êrişê nêzî 60 000-70 000 nufûsa wî hebû, nuha bi carê de wêran e û ji hezaran Kurd re bûye gorr.

Wek tê zanîn li hember gelê Kurd ev ne cara pêşin e ku Seddamê xwînxwar bombeyên kîmyewî bi kar tîne. Bi karanîna bombeyên kîmyayî ji Nîsana par de dest pê

kiriye. Berî jenosîda (qirra) Helepçê, di 25'ê Sibata '88'an de jî li Dolî Cafetî bombeyên kîmyewî hat bikaranîn. Di vê êrişê de jî 12 pêşmerge şehîd ketin û 200 kes jî birîndar bûn.

Cardin li gor xeberên ji herêmê tên, rewşa kesên birîndar gelekî xerab e. Û bi

her hawî muhtacî alîkariyê ne. Li ser vê yekê rojnamavên Swêdî wisa dibêje: "Tiştê ku pîrî tesîr li min kir ziyareta nexweşxanê û dîtina birîndaran bû. Nexweşxanek hewqasî îptîdaî (prîmîtv) ! . (Di rûpelên me yên din de hûnê hevpeyvînekê bi Stefan Hjertên re bibinin).

Di van rojên dawî de şerê Îran û Iraqê gurtir dibe û Îran gav bi gav pêş de dihere û ev jî tê wê manê ku wê li ser axa Kurdîstanê şer, hîn dom bike û wê Kurd jî her di ortê de bîn kuştin. Û kuştina Kurdan jî ji her du aliyên re kar e...

Jenosîda Helepçê hat protestokirin..



Kurdên Eskilstunayê (Swêd) bi grewa birçibûnê Iraq protesto kirin. Foto: Armanc

çêdikin ji alî Almanya ve hatine avakirin. Û heger ku Almanya, perçeyên (aletên) ku karin van şilehana çekin nede wan, Iraq bi îmkânên xwe nikare van şilehên kîmyewî çêke. Loma jî di vî warî de mesûlye tek Almanya jî heye. Û di piştî vê

Koma Miletan, ji Rêxistinên Navnetewî ya Efu yê, ji Xaç Sor, ji Dêra Swêdî û.ê.d. daxwaz tê kirin ku ew vê hovîtiya diktatoriya seddam protesto bikin û piştgirî û alîkariya xwe bi gelê Kurd re nîşan bidin.

Federasyona Komelên Kurdîstanê li dijî konsoloxana Iraqê meşek mezin çêkir. Nêzî 3000 kesî tevî meşê bûn. Li Swêd ev cara pêşî bû ku Kurdan, meşek hewqas mezin çêdikirin. Di meşê de li gel axaftina serokê Federasyonê û hemû rêxistinên Kurdîstana Iraqê, nûnerên Sosyaldemokrat, Center (Partiya Merkez), Modaratan (Muhafezakar), VPK (Partiya Çep a Komûnist) û partiya Sosyalist jî peyivîn, hukûmeta Seddam protesto kirin û piştgirî û sempatiya xwe rê gelê Kurd dan. Çaxa meşvan gihîştin ber konsoloxana Iraqê, gelek kesî xwe negirt û êriş birin ser konsoloxanê û kevir kirin. Li ser vê yekê di navbera polis û meşvanan de hin rakîşandin çêbû; li netîce, meş bi serfirazî qediya.

22-03-'88'an de Seksiyona Jinan a Komela Kurdîstanê ji hukûmeta Swêd re nameyek vekirî şand. Jinên Kurd di nama xwe de dixwestin ku hukûmeta Swêd vê barbarî û jenosîde protesto bike.

25-03-88'an Komela Kurdîstanê li Uppsala meşek protestoyê çêkir, qasî 200 kesî tevî meşê bûn. Di vê meşê de jî ji VPK Oswalt Soderqwist û ji Partiya Sosyalist jî Lasse Petersson peyivîn.

24-03-88'an de Kurdên ku li bajarê Katarinaholmê meşek çêkirin. Di navbera 25-28'ê meha Adarê de li bajarê Eskilstunayê 5 Kurd ketin grewa birçibûnê. Û roja dawî çalaki-

ya xwe bi meşekê qedand. 27-03-88'an de TV'a Swêd bi Serokê Federasyonê Keya Îzol re hevpeyvînek çêkir. Serokê Federasyonê piştî bersiva hin pirsan, gazin ji mesmediya kir û xwest ku ew bêtir alaquadarî bûyerê bibin.

Awûsturya
27-03-88'an de li Wiyanyê bi sedan kesî li dijî konsoloxana Iraqê meşek çêkir. Li gor agahdariyên gihîştin destê me, di meşê de sîxurên Iraqê prova kasyonek çêkirin, di meşê de teqîn derxistin. Û li ser vê yekê li dora 60 kesî ji alî polis ve hatin girtin.

Amerîka
29-03-88'an de bi sedan kes li Waşintonê li ber Konsoloxana Iraqê meşek protestoyê çêkirin. Meşvanan konsoloxane kevir kir û camên wê şikandin.

Almanya Federal
Grûbek hevalbendên KKDK bîneya Radyo û Telewîzyona Alman (WDR) îşxal kirin, xwestin ku ew di xeberên xwe de bêtir cî bidin vê barbariyê. Cardin grûbekê bîneyên SDP û DGB'ê îşxal kir û ji wan jî daxwaziya piştgiriya bi gelê Kurd re kirin. Bi van tevgeran re hin rojnamên mezin hatin ziyaret kirin û înfomasyon ji wan ve hate dayin.

LI aliyê din AKSA; KKDK; KOMKAR; Rizgarî, PDK-Elparti, Yekîtiya Ciwanên Sosyalistên Kurdîstan, Yekîtiya Nîştîmanî Kurdîstan, TKSP, KDHP, KSSE, HSK, YKD, Yekîtiya Xort û Xwendevanên Kurd li Ewropa, KURDKOM û Partiya Gelî Kurdîstan ên li Almanya Federal bi hev re belavokek bi Almanî derxistin. Van rêxistinên Kurd di belavoka xwe de dibêjin ku "Ew fabriqên ku li Iraqê silahên kîmyayî

rexnê ji hukûmeta Alman tê xwestin ku ew, vê alîkariyê ji ser Irtaqê bibirin û zêdetir nebin sebebê qirrkirina gelê Kurd.

Îngiltere
27-03-88'an de li Londrayê şeva Newrozê bi munaşebeta jenosîde bû şevêk bîranîna şehîdên Helepçê. Parlamenterê Partiya Karkir Jerenay Carbyn jî mîvanê şevê bû û di şevê de axaftinek kir. J. Carbyn di axaftina xwe de li ser ziyareta ku wê Serok Wezîra Îngilterê M. Thatcher ji Tirkîyê re bike sekinî û got ku "Armanca ziyareta M. Thatcher ne ku bizanibe çima zindanên Tirkîyê û Kurdîstana Tirkîyê tije ne, ne ku bizanibe ji bo çî gelê Kurd di bin zulmek nedîtî de ye. Armanca ziyaretê, hin bêtir firotina şilahan e..."

Piştî dawîya programê hemû kes bi hev re çûn ber Konsoloxana Amerîka. Hetanî roja din seet 10'an li wir hat mayin û protestonameyek teslîmî Konsulos bû. Di namê de ji hukûmeta Amerîka dihat xwestin ku ew, silahên ku difroşin Îran û Iraqê tavilê biseknî ne.

Danîmarka
Li Danîmarka di 25'ê Adarê de ji aliyê Komelên Xwendevananên Kurd ve mitîngek hat çêkirin. Dîsa di 2'yê Nîsanê de mitîngek ji aliyê Komîta Piştgiriya Kurdîstan ve ku ji 10 partî û rêxistinên Kurd pêk tê, hat çêkirin. Di 5'ê Nîsanê de Parlamentoya Danîmarkayê li ser daxwaza Partiya Sosyalist a Gel, li ser bikaranîna çekên kîmyayî munaqêşe vekir û di dawîya cvîne de Iraq hat protesto kirin. Dema parlamento li ser vê meselê munaqêşe dikir, li derveyî parlamentoyê jî bi sedan Kurd sloganan diavêt û piştgirî dixwest.

Xaçepîrs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

ÇEPERAST: 1-Di sedsala 17'an de li dijî Şahê Îranê bi mêrxasî axa Kurdîstanê parast. Eşîrên Kurd yên Mukrî gihand hev, li devera çiyê, li Kurdîstana Rojhilat kelheyeke pîrî asê û mezin ava kir, tevî gelek mêrxasên Kurd heta dilopa dawî ya xwîna laşê xwe berevaniya kelê kirin. Di vê berevaniyê de ew dever bû şahidê şerên pîrî giran û bi xwîn. Û ev bûyer û qehremanî heta niha jî bi awayê çîrokan li Kurdîstanê tê gotin. 2-a) Hazir. b) Ji navê kuran. 3-a) Jêhatî, zîrek. (berevajî). b) Navê mîrekî Botan. 4-a) Agir b) Bi Kurmanciya jêrî; alî, teref (berevajî). c) Rêdan an îzna ku mirov ji welatekî dikare biçê welatekî din. 5-a) Bi Kurmanciya jêrî ji "qanûn"ê re tê gotin (berevajî) b) Mam (berevajî) c) rih, rihdin (berevajî). 6-a) Kurtiya "Doktor". b) Ne, nexêr. c) Lêgerek, verbek. 7-a) Navê kovareke Kurdî. b) Rengek. 8-Bi Kurmanciya jêrî, mezdar (berevajî). b) Dê-m-sifet. 9-Kurtiya-nummer, numare. b) Kok, rih. c) Ji navê qîzan (berevajî). 10-Du tîpên wekhev. b) pirsiyarek (be-

di çîrokên kevin yên Kurdî de çêlî wî tê kirin. c) Xezal, ceylan. 3-a) Êş, kul û kovan (berevajî). b) Li hinek cihên Kurdîstanê ji "ard", "ar" re dibêjin. c) Di Kurmanciya jêrî de daçekek. (berevajî) 4-a) Dayik (berevajî). b) Di kaxezên lîstîkê de (îskambil) yek. c) Kesê ne têr, an ew kesê mihtacî xwarinê (berevajî). 5-a) Serab, serap. An jî navê qîzan. 6-a) Navê serokê PLO (Rêxistina Rizgariya Filistinê). b) No, na. 7-a) Li hinek deverên Kurdîstanê ji zarokên berşîr re dibêjin. b) Bi Kurmanciya jêrî ji "ufuk"ê re dibêjin (berevajî). 8-a) Sala bûrî, sala çûyî. 9-a) Navê paytaxta Ermenîstanê. b) Li Kurdîstana Başûr, bajarek (berevajî). 10-a) Şape, wextê ku li cihên berfîn, berf ji çiyên an jî ji girên bilind bi ser newal û gund û bajaran de tê. b) Ji navê rojên hefteyê. c) Ard, arvan. 11-a) Kar, şixul. b) Navê dildara Memê Alan. c) Ne tarî. 12-a) Kurdên ku welatê xwe, miletê xwe difroşe, xiyane netê dike. b) Şairê navdar yê Rûsî ku bîngê zîmanê literatûrî yê Rûsî danî û xwediyê yekemîn romana helbestî di edeba miletê Rûsî de. Di sala 1799 ji dayik bûye û sala 1837'an de hatiye kuştin.

SEREJÊR: 1-a) Ji wan rastgeh an destên li serê çiyên re dibêjin. b) Şairekî bi nav û deng ê Kurdan ku di sala 1920'ê de ji dayik bûye. Bi navê Alakok û "pîrsên zêna mirov li ser xweşbextiyê pirtûkên wî hene. 2-a) Alet, alav, hacet. b) Navê ejderhayê pîrî bi tîrs û saw yê ku

Bersîva hejmara berê

Çeperast: 1-Yilmaz Guney. 2-a) ala, b) pîr, c) Alan. 3-a) pîrsek, b) derya 4-a) ba, b) mî, c) pûş. 5-a) hoy, b) şî, c) tî, d) rû. 6-a) ên, b) lîs, c) ûc. 7-a) dilxwaz, b) Adar. 8-a) hê, b) kedê. 9-a) sî, b) kû, c) berû. 10-a) derd, b) eve. 11-a) raman, b) aborî.

Serejêr: 1-a) yar, b) hêz, c) sar. 2-a) li, b) Ronahî. 3-a) çal, b) wê. 4-a) bi, b) ax, c) Arî. 5-a) ap, b) aş, c) lê d) ne. 6-a) diz, b) dudilî. 7-a) merk, b) kedî. 8-a) stêr, b) rê. 9-yan. 10-a) pale, b) atrep. 11-a) ya, b) durû, c) Eva. 12-nûçucanbe.

AFGANÎSTAN

Ber bi qonaxek nuh ve

Hukûmata Afganîstan û Pakîstanê roja pêncşemiyê, 14'ê Nîsana 1988'a li Cenewrê peymanek dîrokî, peymana aşîtiyê îmze dikin. Nûnerên hukûmeta Pakîstan li ser navê Mucahîdên kevneperst di civînan de beşdar dibin û vê peymana aşîtiyê îmze dikin.

Wek tê zanîn ev 6 sal in ku di nav Pakîstan û Afganîstanê de ji bo peymanek weha gelek civîn çêbûn. Di civîna dawiyê de, ku di hefta pêşî ya Nîsanê de dest pê kiribû, gihîştin netîceyekê; li ser 4 madeyan li hev hatin:

- 1- Ji der ve de wê tu mudaxelejê nav Afganîstanê nebe.
- 2- Muhacirên Afغانîstanî wê li ser daxwaza xwe veşerîna welatê xwe.
- 3- DAY (Dewletên Amerîka yê Yekbûyî) û Yekîtiya Sovyet wê dewletên garantor bin.
- 4- Yekîtiya Sovyet wê qedeme bi qedeme leşkerên xwe ji Afganîstanê bikişîne.

Wek tê zanîn di Nîsana 1978'a de bi serokatiya Nûr Muhamed Terakî, Partiya Gel a Demokratîk li Afganîstanê bi şoreşekê, Dawud Xan xist, îktîdarek demokratîk ava kir. Hîn du salên şoreşê neqediyabûn, Hafîzullah Amîn derbek çêkir, Nûr Muhamed Terakî xist û ew ket dewsa wî. Şeş meh di dû re jî Babrak Karmal li hember Hafîzullah Amîn derket û îcar wî ew xist. Partiya Gel a Demokratîk di sala 1986'a de di kongra xwe de Necîbulah ji bo sekreteriya partiyê hilbijart.

Dewletên emperyalîst, nemaze DAY ji bo ku îktîdara demokratîk a Afganîstanê



Leşkerên Sovyetê di merasimekê de. Gel bi dilxweşî wan bi rê dike.

hilweşîne ji roja pêşîn de heta nuha çî ji dest tê kir û dike. Alîkariyek mezin dide kevneperestên Afganîstanê; sîleh, pere, sihî û h.w.d. Bi tesîra vê xebata emperyalîzmê îro 5 milyon Afganî li Pakîstanê muhacir in. Ev yek tesîrek mezin li Pakîstanê dike û di nav civata wan de pîrsgirêkên nuh rû da. Pakîstan, ji bo ku ji bin vî barî derê ne ji îro de ye ku dilxwaza peymanek wiha dikir. Lê ji bo DAY, hilweşandina îktîdara demokratîk a Afganîstanê wek vatîniyekê dabû pêşîya xwe, ne dilxwazê peymanekê bi vî rengî bû. Lê DAY îro mecbûr ma ku vê peymanê qebûl bike.

Bi vê peymanê Afganîstan ket qonaxek nuh. Bê şik ev pêşveçûnek nuh e. Lê hîn şikên nuh bi xwe re anî rojevê. Gelo piştî vegera muhaciran û kevneperestan, wê hêzên emperyalîst û bi taybetî jî DAY destên xwe ji nav Afganîstanê bikişîna ya na? wê ji nû ve xwîn neyê rijandin. Dewletên emperyalîst wê bi vê peymana di nav Pakîstan û Afganîstanê de, çêdibe sadiq bimînin yan na? Lê ji îro de tiştê diyar e, ku heta menfeeta DAY'ê di tevliheviyê de hebe wê li Afganîstanê her xwînê bide herikandin.

Di sedsala XXI'an de wê nufûsa dinyayê çiqas be ?

Li gor îstatîstîkên UNECKO'yê di destpêka sala 1980'î de nufûsa dinyayê di ser 4,5 milyarî re bû. Ji van 4,5 milyar 3,3 milyar (yan jî ji 4/3) li welatên di merhela pêşketinê de û yê din jî li welatên pêşketî bûn.

Di navbera salên 1960 û 1970'an de li dinyayê zayîn zêde bû. Lê di navbera salên 1970 û 1980'an de wê zêdebûn kêm bû. Li gor îstatîstîkên ji wê çaxê û vir de ev prosesa kêmîna zayînê hîn dom dike. Ji ber ku welatên wek Çînê û Hindîstanê hin tedbîr standin ku nufûsa wan zêde nebe. Wek tê zanîn ev herdu welat teqîben nîvê nufûsa dinyayê pêk tînin.

Ku bi vê tempoya îro, nufûsa dinyayê zêde bibe, teqîben di sedsala XXI'an de nufûsa dinyayê wê wilo be: di sala 2000'î de 6,2 milyar; di sala 2050'î de 11 milyar; di sala 2100'î de 12,3 milyar; di sala 2150'î de 13,5 milyar û wê wisa dom bike.

Di dinya me ya îroyîn de zayîna herî bêfir li Nijeryayê dibe. Piştî wê Bengladeş û Pakîstan tê. Û zayîna herî kêm jî li Almanya Federal çêdibe. Ku li Almanya Federal zayîn (welidîn) bi vê tempoyê dom bike wê di sala 2000'î de nufûsa wê dakeve 52 milyonî û di sala 2030'î de wê dakeve 39 milyonan, di sala 2070'î de jî wê dakeve 22 milyonan. A nuha nufûsa Almanya Federal 60 milyon e. Hin alim (zana) dibêjin ku heger Alman bi vî hawî dom bikin wê rojek bê ku miletê Almanya Federal ji ruyê erdê rabin.

Berê wê Sovyet Biçe Marsê

Yekîtiya Sovyet wê meha Temûzê, du keştî-yên mezin ên asmanî ber bi Marsê bişîne. Hedef Mars bi xwe nîne lê hîva wê Fobos e. Fobos ji Marsê 6000 km. dûr e.

Ev hîva ha ji bo çûyîna Marsê dê bibe gava pêşî. Ji ber vê yekê jî dixwazin pêşî analîza wê hîvê bikin.

Proja fobosê yek ji projên Sovyetî ye ku hêviyek mezin jê tê kirin. Siyaseta Glasnost di vê projeyê de rolek girîng leyst. Sovyetî tenê rîya çûyîna Marsê eşkere nekirin di ser de jî gelek welatên Ewrûpî dawet kirin ku di vê projeyê de cî bigrin.

Instrumentên her du keştîyan jî li welatên wek Swêd, Almanya Federal û Finlandiya hatine çêkirin. Di vê projeyê de komîta Asmanî ya Ewrûpî (ESA) jî cî digire. DAY tenê ji bo taqîbkirina şopa herdu keştîyan bi teleskopên xwe alîkariya wê projeyê dike. Ev radyoteleskopên mazin li Avustralyê, Îspanyayê û Kalîforniyayê ne.

Yekîtiya Sovyet berî ku keştîyên bi astronot rêbîke Marsê dixwaze yan li Fobosê yan jî li Deymosê (ev jî hîveke Marsê ye) binkeyekî ava bike da ku çûyîna Marsê hêsantir bibe.

Kesên pispor di wê bawerîye de ne ku, Yekîtiya Sovyet wê berî sala 2000 keştîyek bi astronot bişîne Fobosê û ev her du keştîyên ku îsal wê bêtin şiyandin ji bo hazîriya wê ye.

Herdu keştîyên ku îsal tînin şiyandin wê hem fotograf bikîşînin û hem jî wê erdê fobosê ji alî fîzîkî û kîmyewî ve analîz bikin. Dema keştîyên Fobosê piştî 200 rojen bigihîjin ciyê xwe, wê li dora Marsê bikevin şopeke direj û girover. Piştî 2-3 hefteyên din dê şopa keştîya pêşî bête guhertin û wê tenê 50 metre ji Fobosê dûr be. Keştî wê li dora Fobosê di saetê de 20 km. bi sur'et bifire.

Dem a keştî bi vê sur'eta nizm li ser Fobosê bifire, wê yek an jî dû keştîyên ku li ser Fobosê dakevin, berde.

Bi daketina keştîyê ve wê tîrejeke laser pêkeve. Ronahiya laserê wê di rûyê Fobosê de gaz peyde bike. Bi analîza bûxarên ku ji gaz der diçin, astronotên li dinê dikarin bi temamî

înfomasyon li ser rewşa kîmyewî ya erdê Fobosê bistînin.

Piştî firina nêzî Fobosê keştîya asmanî wê berê xwe bide şopeke li dora Marsê ku pir nêzî şopa ku Fobosê li dora Marsê dizivire, ye. Ji vê şopê, sînyalên ku keştîya li ser erdê Fobosê bişîne wê bigire.

Keştîya din di vê demê de wê di şopa xwe ya dûrî Marsê de be. Eger keştîya pêşîn di karê xwe de bi serkeve wê keştîya duyemîn berê xwe bide Deymosê ku ji Marsê 20.000 km. dûr e.


Hîvên Marsê wek kartolê ne

Fotografên Fobosê û Deymosê yê ku ji nêz ve hatinê kişandin, cara pêşîn di sala 1976'an de jî alî keştîya asmanî ya Amerîka Vîkîng ve hatibûn kişandin. Fotograf nîşan dan ku hîvên Marsê ne girover in wek kartoê ne. Hîvê herî mezin Fobos e û direjahiya wî nêzî 20(23) x 28 km. ye. Deymos jî piçûktir e û nêzî 10(16) x 28 km. dirêj e.

Erda herdu hîvên jî pir reş e û wisa tê texmîn kirin ku ev reşbûn ji asteroidên ku ji wan re C-asteroid tînin gotin, tê. Di van asteroidan de pir komir û nêzî %10 jî av heye. Eger ev yek ha rast be, dê mirov bikaribe bi firinên (tendûrên) rojê avê ji çiyayên komir derêxe û ji bo roketên keştîya asmanî oksîjen û hîdrojen peyda bike.

Eger biryara avakirina bask binkeyek li Fobosê yan jî li Deymosê bête standin wê çaxê mirov wê bikaribe wê ava kîmyewî ji bo roketan wek benzîne bikar bîne. Bi avakirina îstasyona tankê di rojên dahatî de mirov wê bikaribe keştîyên bi astoronok rê bike asman û bi vî awayî çûn û hatin wê hêsantir û erzantir bibe.

Lêkolîna Fobosê û Deymosê jî ber vê yekê jî bo seyahatên ber bi Marsê girîng in. Lê belê herdu hîvên piçûk jî ji alî lêkolînê ve girîng in.



Fobos wê wisa herin Marsê: Îsal di meha Temmuzê de wê Fobos bi alî Marsê de bê şandin. Di risim de pozîsyona Dinyê û Marsê bi hev re xwanê dike.